

## Seydayê Êşa Peyvê û Peyva Êşê

Di wêjeya Kurdî da problema sereke vebirr e, bi raya min. Em di nav nifşan de ji têkiliya bertek û şopandinê zêdetir vebirrê dibînin. Ne tenê nifşên li pey hev tên, piraniya endamên heman nifşî jî hevdu nasnekirine. Wek mînak, Berken Bereh û Arjen Arî... *Selîm Temo / R.5*



## "destê min bi destê yar e..."

Tu Kurdistan î, erdê te kesk û zer, ezmanê te şîn e. Şîn e hesret ji bendewariyê re. Loma sebr mîxên xwe dikirin avê, av zengar digirt. Digirt rê xwe ji waran, warwara dilê rezîl dima li ber deriyê sêwiyan... *Yildiz Çakar / R.5*



## Çîroka jinekê; Eyşoya Dîn

Di çarşîya Licê de diçû dihat. Fistanekî dirêj lê bû, kofî li serî bû. Li ser singê wê potên ziravikên rengîn hebûn, wekî gulik bi hev ve girêdidan. Rehmetîya dêya min terzîtî jî dikir. Baş tê bîra min, carek dêya min jê re fistanek dirût... *Roşan Lezgîn / R.8*


Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

20 - 26 Nîsan 2020
Hejmar: 18
Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org


# Xefika Zînî Wertê!

Di demeke ku hewldan û daxwazên yekitiya neteweyî di rojevê de ne, li başûrê Kurdistanê geşedanên balkêş diqewimin. Lê mixabin bûyer û rageşiya li ser herêma Zînî Wertê ya başûrê Kurdistanê diqewime, mirov dixe nav fikaran ka li wê derê, sê hêzên sereke yên kurdistanî çima tên li hemberî hev. Lê heke hesabekî cuda hebe ku hêzên kurdî tîne beranberî hev û balafirên dewleta tirk herêmê bombebaran dike...

*Mem Avba / RÛPEL - 7*



## Armanc valakirina Mexmûrê ye

Çend roj berê balafirên artêşa tirk êrîşî wargeha penaberan a Mexmûrê kir. Ev wargeha ku şêniyên wê bi temamî sivîl û di statuya penaberên siyasî de ne, ev bû çend car dibe hedefa êrişên dewleta tirk. Di van rojên ku hemû mirovahî di nav lepê virusê de û bi halê xwe ketiye, hemû derd û xema dewleta tirk jî ew e ku êşên hîn mezintir bi gelê kurd bide kişandin. Her kes serpêhatiya wan dizane... *Felemez Ulug / R.3*

## Cejna Çarşema Sor

Li gorî bîranînên nivîskar Ezîzê Cewo, dema ku kebanî kulîçeyan çêdikin moriyekê dikin nav wê. Mezinê malê di taştêya serê siba cejnê de kulîçeyê bi gotina 'ev para Mêrê Rojê, ev para Xudanê Malê, ev para Ziyayê Zer, ev para Mamereşan, ev para Mamê Şivan, ev para Gavanê Zerzan, ev para xeta cot, ev para malxêyê malê, ev para rêwiyê me, ev para xwendekarê me…' yeko yeko dijmêre û kerî dike... *Ayhan Erkmen / R. 8*

## Piyaseya Hirçê li hemû cîhanê dest pê kir

Li derdora 730 biliyon dolarî ye û li gorî texmînên IMF'ê piştî krîza şewba Covid-19'ê di 2020'an de ew ê slumplflasyon çêbe, him DNG kêm bibe û him jî enflasyon zêde bibe. Di vê pêvajoyê de polîtîkayên aramiyê tenê ji bo komeke biçûk tên amadekirin. Ji bo demên ku senedên parên şirîkatiyan û hemû îndikatorên piyaseya fînansê dadikevin, di zimanê guhertingehê de "Piyaseya Hirçê" tê bikaranîn. Wisa xuya ye ku piyaseya hirçê li hemû cîhanê ji ber Covid-19'ê dest pê kir. Di nav vê tevlihevî û qelqeleyê de li Tirkiyeyê jî qeyrana Covid-19'ê li piyaseyê xist. Rez ji xwe ne tu rez bû, hirçê jî lê xist... *Ramazan Tunç / RÛPEL - 6*

### Têkiliyên bi jiyana online

## Di demên dîjîtal de birêxistinkirin

Danûstandinên dîjîtal bandora xwe li jiyana me ya rojane dikin. Bi rêya înternetê em ne tenê der barê mijaran de dibin xwedî agahî, di heman demê de ev platform ji bo tevgera kollektîf û tevlêbûna polîtîk jî roleke navendî dilîzin... *Munewer Azîzoglu Bazan / R.2*

## Cinîya bêgan û însanê gandarî

Comêrd şer'id cinîyon kerdên kole. Motîvasyonê şerî ra yew zî koletî bi. Ne azadîya xwu ser ne zî conê xwu ser heqê vatişê cinîyo çîn'ib. Wexto ke kotên bin deston, bîyên mezemeyê bedelyayîşî. Cinî bîya meseleya mulko xususî. Hezaro ser ra heta eka qet nêameyo fikiryayîşî ke cinî nêverdê rolêk pîl bigerû. Seba ke heqonê xwu bigîra, heqonê resmîyon ra bigîrên heta heqê mîras, heqê rêeştişî... *Av. Cemîle Turhalli / R. 9*

**Albûma Botanê û vejandina dengan...** Welat Ramînazad / RÛPEL - 11



## 'Ev romana nifşê min e'


Nivîskar û helbestkarê kurd Konê Reş pirsên rojnameya me bersivandin û têkildarî berhema xwe ya dawîn wiha got: "Bêguman, ev roman ne serboriya min tenê ye, serboriya piraniya nifşê min e... *Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.4*

## Daneyên rast tên veşartin

Vîrusa koronayê ji kanûna sala 2019'an ve rojeva sereke ya cîhanê ye. Her roj der barê vîrusê de daneyên nû tên parvekirin. Berdevkê Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) Dr. Margaret Harris li Cenevreyê têkildarî hejmara pêketiyên vîrusa koronayê daxuyaniyek da û diyar kir ku hejmara pêketiyên vîrusa koronayê li hin deverên Ewropayê kêm dibe, lê li Îngilistan û Tirkiyeyê jî zêde dibe û Enqere jî daneyên vîrusê vedişêre... *RÛPEL - 7*

## Hecî Qadirê Koyî û rojnameya Kurdistanê

Hecî Qadirê Koyî bandoreke mezin li ser Mîqdad Mîdhet Bedirxan û Evdirehman Bedirxan (1868-1936) kiriye da ku rojnameyeke kurdî biweşînin. Lê mixabin Hecî Qadirê Koyî salek berî ku rojnameya Kurdistanê derkeve, di 1897an da li Stenbolê çûye ser dilovaniya xwe... *Ahmed Kanî / R.12*



# Di demên dîjîtal de rêxistinkirina tevgeran (1)



Biyan
Munewer Azîzoglu Bazan

Pêvajoyên protesto û dij-protestoyan, her wiha desthilatdarî û berxwedaniyan di sedsala 21'emîn de bêyî amûrên dîjîtal nikarin bên fikirîn. Medya wek hêza 4'emîn mohra xwe li hemû şoreş û dij-şoreşên sedsala 20'an xistibû. Di roja me ya îroyîn de êdî em dikarin medyayê bi naverokên wê yên guhartî wek hêza yekemîn bi nav bikin.

Danûstandinên dîjîtal bandora xwe li jiyana me ya rojane dikin. Bi riya înternetê em ne tenê der barê mijaran de dibin xwedî agahî, di heman demê de ev platform ji bo tevgera kolektîf û tevlîbûna polîtîk jî roleke navendî dilîzin. Êdî protesto û çalakî bi riya înternetê bi amûrên cûrbecûr ên wek vîdeo, wêne, grafîk, nivîs û hwd. bi awayekî gerdûnî xuya dibin û bi tenê pêlêkirina bişkokekê xwe digîhînin milyonan.

Têkiliyên bi jiyana online têkiliyên civakî jî diguherînin û bi vî awayî teşe û naverokên tevgerên civakî jî diguherînin. Ev mêldarî ji mêj ve de heye û gelek rêxistin û tevgerên civakî, şoreşger, çepgir û di heman demê de rastgir vê amûrê ji bo mobîlîzekirina alîgirên xwe bi kar tînin. Zêdetir xuya dibin, rasterast tên dîtin û muhatabgirtin. Yekemîn armanca tevgeran di vê jiyana dîjîtal de der barê xwe de agahîdayîn, propagandakirin an jî protestokirin û her wiha mobîlîzekirin e.

Lê ev pêvajoya ku ji zû ve ye di jiyana me de ye, bi şewba koronayê ji nişkav de giraniyeke din girt. Yek ji amûrên tevgerên civakî bû yekane amûra tevgerê. Ev rewşa awarte bi xwe re hin pirsên rêxistinî jî bi xwe re anîn. Lewre şoreş navberê nas nake. Ji niha de dibe ku ne hewce be mirov senaryoyeke wek filmên "Mad Max"ê bifikire, lê hemî pispor hemfikir in ku dê jiyan êdî ne wek dema berî koronayê be. Pêwîst e tevgerên civakî û şoreşger ên wek Tevgera (jinan) Kurd ku hêza xwe ya bingehîn a tevgerî ji rêxistinkirina gel a rûbirû û ji çalakiyên li kolanan digirin, mecbûr in xwe li gorî pêvajoyê ji nû ve sazî bikin. Dê çalakî û pêşandan di kîjan çarçoveyê de bên lidarxistin? Cudahiyên mobîlîzekirin û rêxistinkirinên "online" û "offline" çi ne? Qadên online çawa dikarin ji bo xurtkirina helwesta polîtîk a alternatîf bên xurtkirin? Û dibe ku pirsa herî girîng, dê rêxistin çawa xwe bigihînin kesên di nav zehmetiyê de ne, kesên bi pirsgirêk û dê karibin çareseriyên xwe çawa bi awayekî şênber bigihînin wan? Her wiha dê kolektîvîte û hevrebûn çawa karibe bê parastin? Çend pirsên di vê çarçoveyê de tên bîra me ev in.

Hema bi destpêka pêvajoya şewba koronayê de gelek rêxistinên civakî xwe li gorî rewşa heyî bi awayekî serkeftî/nîvserkeftî online organîze kirin. Ez dixwazim di vir de bi awayekî şênber qala pratikên rêxistinên jinan ên cîhêreng bikim. Ji ber ku jiyana online di heman demê de wek "space (qad)" dikare bê dîtin, jin vê qadê ji zû de ye ji bo armanc û çalakiyên xwe bi kar tînin. Ji ber ku kolan û qad ji jinan re tên astengkirin, jin ji xwe re beramberê vê qadên nû jî ava dikin, ji ber vê yekê ye jî naskiriyê vê qadê ne.

(1) Gelek rêxistinên jinan destpêkê platformên înteraktîf ên perwerdeyê û danûstandinê ava kirin. Heta niha jiyana dîjîtal ji hêla tevgeran ve bi giranî bi mebestên agahîdayînê û agahîparvekirinê dihat bikaranîn. Lê wek platformeke înteraktîf ku tê de nîqaşên piralî û bi danûstandin dimeşin, nedihat dîtin. Ev fonksiyon niha bi platformên perwerdeyê guherî. Mijarên tên pêşkêşkirin di heman demê de tên nîqaşkirin. Jin bi vî awayî perwerdeya kesane û kolektîv bi hev re parve dikin. Yek ji sûda vê rêbazê ew e ku mirov ji demên berê zêdetir karin tev li van perwerdeyan bibin; ji ber ku "qad"a hatiye avakirin, di nav sînorê xwegihandina kesan de ye. Bêguman fêrbûna/perwerdeya rûbirû bi her awayî çêtir e, lê ji ber ku mijar xwerêxistinkirina li gorî şert û mercan e, niha anînagelhev a fêrbûna rûbirû û ya dîjîtal ne guncav e.

Hefteyeke din em ê li ser xalên din bisekinin.



# Ji Eyşe Şanan heta Hêlînan

Salîha Ayata

Sedsal guherîn lê dengê jinan neguherî. Eyşe Şan di sedsala 20'an de ji bo bikaribe bistrê ji mal revî û berê xwe da bajarên din di nav gelek zor û zehmetiyan de got û lorand heta bimre her di nav têkoşîneke de bû, Hêlîn jî di sedsala 21'emîn de ji bo bikaribe bistrê ket rojiya mirinê û çavên wê vekirî çû.

Eyşeşan di sala 1938'an de li Amedê hat dinyayê. Bavê wê dengbêjekî navdar bû ji ber wê emreke biçûk de mûzîkê re got merheba lê dema ew neh salî bû bavê wê jiyana xwe dest da. Piştî bavê xwe tenê dikarîbû di mewludan de qesîdeyan bibêje û quranê bixwîne lê nexwest bibêje, dixwest stranên kurdî bibêje. Rojekê dîwana dengbêjan de kilamek xelet hat gotin lê Eyşe Şan nikarî bû dengê xwe derbixe ji ber ku ew jin bû û mafê wê tunebû kilamekî sererast bike. Di wê rojê de biryara xwe da ku li hember feodaliteye dê şerek bike û got ez ê li pey kilamên kurdî biçim. Bi vê avayê jiya û bi zorê hat zewicandin lê piştî demekê revî û berê xwe da bajarên din gelek caran bajar û welat guherand. Ji ber ku feodalîteya jê revî li derve jî berdewam dikir ji bo karibe bistrê bi civakê re ketibû tekoşînekê. Eyşe Şan gelek zor û zehmetî kişand, li hember fodaliteyê û civaka girtî ya li hember jinan şerek da bû destpêkirin di şerê xwe de bi tena sere xwe bû, lê serbilind bû heta bimre ev şer her berdewam kir.

Hêlîn Bolek eslê xwe ji Amedê ye di sala 1992'yan de li Stenbolê hatiye dinyayê. Di ciwaniya xwe de bûye endama Grup Yorumê wek solîst dest bi muzîkê kiriye. Emreke ciwan de bi dehan caran derketiye li ser sahneyan û gelek kilamên cur be cur gotiye lê 2016'an de operasyonek dest pê kiriye û ji Navenda Çanda Îdîlê, Hêlîn û heft hevalê wê hatine girtin piştî opersayonê hemû konser û bernameyên wan hatine betalkirin. Ji bo vê rewşê biguherînin û zexta li ser wan bişkê 17'ê gulana 2019'an de Hêlîn û çar hevalên wê dest bi greva birçîbûnê dikin û pişt re dibe rojiya mirinê. Daxwaziyên wan pir zelal û hêsan bûn; bila qedexeya li ser konserên wan rabe û bikaribin bibêjin û bistrên di sedsala 21'emîn de laşê xwe li ber mirinê raxistin û gotin em dixwazin stranên xwe li her derê bibêjin. Di roja 288'an de Hêlîn bi çavên vekirî jiyana xwe dest da. Rojiya mirinê hêjî ji bo hevalên wê berdewam dike.

Dema mirov her du jinan dinihêre Eyşe Şan li hember feodaliteyê û civaka girtî bi serê xwe ket nava tekoşînekê, Hêlîn jî weke her mirovekê xwest li her derê karibe bistrê û azad bijî ket nava tekoşînekê. Sedsal çiqas biguherin jî têkoşîna jinan ji bo bikaribin bistrên û azad bijîn neguhurî. Ev jin ji hêza hunere haydar bûn dizanîbûn bi rêya hunere û stranên azad dikarin civaka xwe biguherînin û ji bo jinên din jî rêya azadiyê vekin. Erê êdî bi me re nîn in lê tekoşîna wan hunermendan dê tim rêya jinên hunerhez veke û ji bo wan bibin sembolên tekoşînê, ji bo jin bistrên bibêjin dê her li ber xwe bidin. Ji civakê Eyşeşan û Hêlîn dê tim derkevin lê jin ji bo azad li her derê bistrên hêj divê çiqas berdêl bidin?



Reyhan Îke

# Bêdengî erêkirin û şirîktî ye

Carna li hember tiştên çêdibin û mirov jê re şahidiyê dike peyv hêza vegotinê winda dikin. Hest lal û pênûs stewr dimînin. Qêrînek bêdeng xwe li asoyên dil dialîne û hemû hevok li ber êşa tê jiyîn stûxwar dimînin.

Baş e ma em ne mîkro kozmos bûn? Ku mîkro kozmos xwebûn, enel haq, nîrvana û enerjiyek bêdawî be, çi ye ev bêçarebûn û bêhêziya me? Çi ye ya em evqas ji hev parçe kirin û anîn rewşeke ku em bi xwe jî xwe fêm nekin? Tişta em ji tevahîbûna me evqas dûr xistin çi ye, em çawa evqas bûne biyaniyên heqîqeta xwe?

Baş e ya em lê digerin bûyîna hêz, desthilatî, iqtîdar e? Ma di makro kozmosê de iqtîdar heye? Nexêr! Ji ber li cihê iqtîdar, serdestî hebe mirov nikare behsa lihevhatinek bêdawî û parvekirinê bike. Ji ber cihê ku lê lihevkirin, parvekirin, curbicurî û cudahî hebin iqtîdar nikare xwe ava bike. Îqtîdar desthilatiya li ser parçekirin, biçûkkirin û lewaziyan e. Yanî bûyîna iqtîdarê dûrketina ji xwebûna xwe ye.

Çanda sereke ya îqtîdarê kuştin e. Kuştina hemcureyên xwe û lawiran dike çandek. Îqtîdar û bêîqtîdarî du seriyên vê çandê ne. Di rastiyê de herdu jî îqtîdarê xwedî dikin. Yek bi tirsa windakirina îqtîdara xwe, ya din jî bi tirsa jidestdayîna jiyana xwe ji vê çandê re xizmet dike. Îqtîdar û tirs destebirayên hev in di vê çandê de. Yek bi hemû hêza xwe hewl dide îqtîdara xwe qayîm bike, ya din bêîqtîdariya xwe dipejirîne, bi hemû salûsiya xwe ve hewl dide xwe nêzîkî îqtîdarê bike û jiyana xwe bigire bin ewlekariyê. Ev herdu seriyên wekî dijberî hev tên dîtin jî xwedîkerên çanda kuştinê ne. Ji xwe dema çanda kuştinê serwer bû, trajediyên mezin ên jiyana mirovahiyê jî dest pê kirin.

Trajediya herî mezin bi riya vê çanda kuştinê belavbûna civak û kesayetê ye. An ku dûrxistina ji hebûna xwe, biyanîkirin e. Kedîkirina ji aliyê sepandinên hişmendiyeke kujer ve ye. Bi vî awayî tirs dibe dojeha mirovan û ev dojeha ku ji tirsên mirovên bûyîn heyber pêk tê, kirdeyan, an ku desthilatdarên îqtîdarê datînin ser textê xwedatiyê.

Li gorî hemû baweriyên olî, xweda mezintirîn hêz e. Ti hêz nîne ku bikare pêşiyê li biryar û kiryarên xwedê bigire. Gotinên xweda ferman in û li dijderketina wan bi dojehê tê sezadan. Xwedê bixwaze dide, bixwaze dikuje, bixwaze baş, bixwaze xirap dike. Ti desthilata vê lêpirsîn bike nîne. Îro îxtîdar û desthilatdarên dewletan jî heman tiştî dikin. Bixwaze dikuje, bixwaze diavêje dojehan an ku girtîgehan, bixwaze têr, bixwaze birsî dihêle. Li hemberî hemû biryar û kiryarên xwe jî wekî vîna xwedayî benîbûnek bêsînor ferz dikin. Ev hêza ku bi hezar salan bi riya zorê, şer, kuştin û talanan ev tişt dikirin, îro ji her demê zêdetir xeter bûye. Tevî her awayê zorê, bi riya aborî, perwerde, tendurîstî, huner, hiquq û bi riya teknolojiyê kontrola mirovan dixe dest xwe, hûtê tirsê mezin dike û vê çanda kuştinê piralî dike. An ku tiştên di serê diktatoriyên leşkerî re derbas jî nedibûn, ji aliyê diktatoriyên sivil ve pir pisporane tên kirin.

Lê tişta mirovan jî janê bêzar dike ne zilm û zora desthilatdaran e. Bi hezar salan e li hember zilm û zora heyî berxwedan jî hatiye kirin û mirovahiyê xwestiye rûmeta xwe, mafê xwe yê jiyanê di bin her şertî de biparêze. Girtîgehên Tirkiyê bi serê xwe têra piştrastkirina vê têkoşîna parastina rûmetê dikin. Bi deh hezaran kurd girtî ne. Tevî hemû polîtîkayên tinekirinê jî yên li hember vê zilmê şer dikin, ji bo parastina rûmet û jiyana gelê xwe bêfikar giyana xwe dikin qurban ne kêm in. Îro jî gund, çiya û zozanên me tên bombekirin. Li çar parçeyên Kurdistanê ji ber parastina doza xwe mirov ji aliyê dagirkerên Kurdistanê ve tên kuştin. Birçîbûn, penaberî, zilm û zor, girtin û êşkence berdewam e. Di van rojên ku dinya di nav lepên virusa koronayê de wextên zehmet dijî jî, ji bo dewleta tirk erka sereke kuştina kurdan e. Roja pazdeyê nîsanê dewleta tirk bi firokan êrîşî wargeha penaberan Mexmûrê kir û sê jinên kurd qetil kirin. Çima, gunehê wan çi ye? Ji ber vî gelî parastina rûmeta xwe bijartine. Ji ber biryar û fermana xwediyên îqtîdarê derketiye. Ji ber wê dikarin bên kuştin. Dîsa beriya çend rojan di kesayeta Egîd Îpek de dewleta tirk hestiyên me kir pakêt û bi riya kargoyê şand ji dayîkek kurd re. Gelo kurdek birûmet, xwedî wijdan heye ku bi vê dimenê neêşiyabe?

Bêguman, ev mirovan pir diêşîne. Lê ya ji wê biêştir, zortir û girantir bêhelwestî û bêdengiya beşek ji civaka me û hinek partî û rêxistinên siyasî yên kurdan e. Wekî min ii jor jî gotî bêdengî erêkirin e û erêkirin şirîakatî ev çanda kuştinê ya îqtîdaran e. Ev gel bi sedan salan e ji siyaseta kurd yekîtiyê, yekdengiyê dixwaze. Lê mixabin li hember kuştina kurdên penaber jî hikûmeta herêma Kurdistanê deng dernexist. Her bêdengî û bêhelwestî tê wateya ku em kuştina xwe, mirina xwe erê dikin. Îqtîdar û mêtingerî ne makro kozmos e, makro kaos e. Yekane çareserkirina vê kaosê yekitî, piştgirî, parvekirin û alîkarîdayîna hev e; li hember zilm û zorê bilindkirina dengê xwe ye. Ger em mîkro kozmos bin, wê demê em bi hev re dikarin xwe ji vê kaosê rizgar bikin.

# Şerê navxweyî û îstîfa

Wezîrê Karên Hundir Suleyman Soylû ji ber şerê navxweyî yê AKP'ê îstîfa kir û îstîfaya wî ji hêla Erdogan ve nehat qebûlkirin. Soylû bi vê îstîfayê destê xwe yê di şer de xurt kir

Qedrî Esen

Desthilata AKP'ê di 12'ê nîsanê de bi qrîzeke mezin re rûbirû ma. Wezîrê Karên Hundir ê AKP'ê Suleyman Soylû ku serkêşiya polîtîkayên zext û zordariyê dike û her roj gefê li muxalefetaTirkiyeyê dixwe, roja 12'ê nîsanê ji nişka ve ji hikûmeta AKP'ê îstîfa kir.

Bi peydabûna vîrusa koronayê re dest û lepê AKP'ê rom bûne û nikare pêvajoyê bi rê ve bibe. Ji ber vê yekê jî qrîzeke navxweyî di AKP'ê de peyda bûye. Beriya îstifakirina Soylû di encama vê qrîzê de Wezîrê Ragihandinê Cahît Tûrhan jî ji aliyê serokkomarê tirk Tayyîp Erdogan ve ji nişka ve ji peywirê hatibû girtin.

**Emir diyar dikir**

Hêj ku 2 hefte bi ser ji peywiragirtina Cahît Tûrhan re derbas nebûbû, vê carê dengekî din ê qrîzê ji AKP'ê bilind bû. Wezîrê Karê Hundir Suleyman Soylû ku bi polîtîkayên xwe yên zext û zordariyan forsan davêt û her carê emir ji rêxistin û tevgerekê re diyar dikir, di 12'ê nîsanê de ji Wezareta Karên Hundir a Tirkiyeyê îstifa kir.

Soylû îstifaya xwe li ser hesabê xwe yê Twîtterê ragihand û bi saetan telefona xwe girt û bersiv neda tu kesî. Soylû, sedema îstafaya xwe jî weke birêvenebirina qedexeya derketina derve nîşan da û got ku hemû berpirsyariya nebirêvenebirinê digire ser xwe.

**Biryar bû aşût!**

Soylû berî ku îstifa bike, di 10'ê nîsanê de ji bo 2 rojan biryara qedexeya derketina dervera gihandibû. Ji ber ku biryara qedexeyê dereng ragihand, li Tirkiye û bakurê Kurdistanê bi sedhezaran mirov ji bo dabînkirina pêwîstiyên xwe daketin ber devê firin û marketan. Ji ber biryara îzolosyonê Soylû bi van dîmenan gelek hat rexnekirin.

Hem partiyên muxalefetê hem jî bi awayekî veşarî Wezîrê Tenduristiyê yê Tirkiyeyê Fahrettîn Koca û endamên Lijneya Zanistê ya Tirkiyeyê, bertek nîşanî ragihandina dema qedexeya derketina derve dan. Endamên Lijneya Zanistê, biryara Soylû şibandin aşûtê û gotin ku bi biryara Soylû re aşût bi ser biryarên wan ên ji bo îzolosyonê de hatiye.

**Sedema îstifayê reqabet e**

Her çiqas Soylû biryara xwe ya istifayê weke mafdariya van rexneyan nîşan da jî sedema îstifaya wî ne tenê ji bo van rexneyan bû. Di nav AKP'ê de ji bilî vê biryara wî jî rexne li Soylû tên kirin. Di navbera wî û zavayê Erdogan Berat Albayrak de ku ew jî weke Soylû endamê kabîneya Erdogan e, reqabeteke mezin heye.

Ji ber vê sedemê îstifaya Soylû ji aliyê Erdogan ve jî bo veşartina ser vê qrîzê nehat qebûlkirin. Erdogan, îstifaya Soylû lê zivirand û wî careke din anî ser Wezareta Karên Hundir a Tirkiyeyê. Îstifaya Soylû hem ji aliyê siyasetmedaran ve hem jî ji aliyê rojnamegeran ve gelek hat şîrovekirin.

**Soylu destê xwe xurt kir**

Serokê Giştî yê CHP'ê Kemal Kiliçdaroglû, destnîşan kir ku ji ber birêvenebirina pêvajoya vîrusa koronayê ji bo xurtkirina destê Erdogan, Soylû îstifa kiriye. HDP'ê jî îstifakirin û qebûlnekirina îstifaya Soylû weke fêhilkirina AKP'iyan şîrove kir.

Rojnameger û gelek derdorên cuda jî îstifaya Soylû nirxandin û diyar kirin ku îstifaya Soylû nîşaneya şerê desthilatê ye. Dîsa gelek rojnamegeran jî destnîşan kir ku Suleyman Soylû bi biryara xwe ya îstifayê destê xwe yê di nav AKP'ê de xurt kiriye.



# Wesîqeya şermê ket meriyetê

Navenda Nûçeyan

Sererastkirina qanûna înfazê ku ji 70 xalan pêk dihat, hat qebûlkirin û ket meriyetê. Li Lijneya Giştî ya Meclisa Tirkiyeyê li ser pêşniyarqanûnê 7 rojan hevdîtin hatin kirin. Di hevdîtinan de HDP, CHP û ÎYÎ Partî 210 pêşniyarên guhertinê kirin. Pêşniyareke muxalefetê nehatin qebûlkirin.

Ji ber muxalefeteke tund û bertekên zêde yên gelek derdorên cuda, di 4 xalan de guhertin pêk hat. Ji bo ku rengê muxalefetê di van guhertinan de xwanê nebe AKP'ê pêşniyarên guhertinê kir û 4 xal guherîn. Guhertina herî balkêş ji bo rojnameyan bû. Li gorî sererastkirinê ketina rojnameyên muxalîf a girtîgehan dihat qedexekirin. Lê li ser bertekên zêde ev xal paşve hat kişandin.

**HDP û CHP diçin DDB'ê**

Peşniyarqanûna sererastkirinê, piştî hevdîtinên 7 rojan, li gel hemû nerazîbûnên muxalefetê jî şeva 13'ê nîsanê bi dengê AKP-MHP'ê hat qebûlkirin. CHP'ê piştî qebûlkirinê, ragihand ku dê ji bo betalkirina qanûnê serî li Dadgeha Destûra Bingehîn (DDB) bide. Dê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) jî ji bo batalkirinê piştgiriyê bide CHP'ê.

Her wiha Hevseroka HDP'ê Pervîn Bûldan, di weşana zindî ya qenaleke televîzyonekê de têkildarî mijarê axivî. Pervîn Bûldan, diyar kir ku hejmara parlamenterên wan têra serlêdana Dadgeha Destûra Bingehîn nake û ji ber vê yekê dê piştgiriyê bidin serlêdana CHP'ê ya ji bo betalkirina sererastkirina înfazê.

**Serokên mafyayan berdan**

Piştî qebûlkirinê pêşniyarqanûna bû qanûn, ji aliyê serokkomarê Tirkiyeyê Recep Tayyîp Erdogan ve hat îmzekirin û şeva 14'ê nîsanê ket meriyetê. Bi vê yekê re berdana girtiyan jî dest pê kir. Destpêkê girtiyên temenê wan di seriya 65'an de ji girtîgehan hatin berdan û piştî re jî girtiyên din ên mîna Alaattîn Çakici yên serok û endamên mafyayan û gelek sûcan kirine, hatin berdan.

Li gel hemû daxwazên partiyên muxalefetê, rêxistinên sivîl, sazî û dezgehên mafê mirovan, hiqûq û tenduristiyê jî girtiyên siyasî ku di nav wan de parlamener, hevşaredar, rojnameger û akademisyen jî hene tev li sererastkirinê nehatin kirin. Ji ber vê encamê dê yek girtiyekî siyasî jî bi vê sererastkirinê neyê berdan.

**Fermana darvekirinê**

Piştî derbasbûn û erêkirina sererastkirinê, HDP'ê bertek nîşanî sererastkirinê da. Alîkarê Hevserokê Giştî yê HDP'ê ku ji Komîsyona Mafê Mirovan û Hiqûqê Berpirsyar e Umît Dede diyar kir ku bi sererastkirina înfazê re 200 hezar girtî terkî mirinê hatine kirin û dijminahiya li hemberî kurdan û derdorên muxalîfan careke din hatiye nîşandan.

Dede got ku qanûna AKP-MHP derxistiye wesîqeya şermê û fermana darvekirinê ye û ev tişt got: "Qanûn bi dengê AKP-MHP'ê hatibe qebûlkirin jî têkoşîna me hê bi dawî nebûye. Em ê bi partiyên siyasî, rêxistinên sivîl û pîşesazî re bi awayekî hevpar mafê jiyanê yê girtiyan biparêzin. Em ê li dijî şer aştiyê, li dijî mirinê jiyanê û li dijî tecrîdê jî azadiyê biparêzin."

**Tu wijdan qebûl nake**

Serokê giştî yê CHP'ê Kemal Kiliçdaroglû jî bertek nîşanî sererastkirina înfazê da û got ku kesên di destê wan de kêr hene derdikevin û kesên ku di destê wan de pênûs hene jî girtî dimînin, tu wijdan û sinc vê yekê qebûl nake.

Bertekeke balkêş jî ji Alîkarê Serokê Giştî yê Partiya Pêngav û Demokrasiyê (DEVA) Mûstafa Yeneroglû hat. Yeneroglû destnîşan kir ku sererastkirina înfazê ji pêwîstiyên civakê gelek dûr e û li dijî Destûra Bingehîn a Tirkiyeyê ye dê ji ber vê yekê ji aliyê Dadgeha Destûra Bingehîn a Tirkiyeyê ve bê betalkirin û bê berfirehkirin.



## Xweşkanî



Felemez Ulug

# Armanc valakirina Mexmûrê ye

Çend roj berê balafirên artêşa tirk êrîşî wargeha penaberan a Mexmûrê kir. Ev wargeha ku şêniyên wê bi temamî sivîl û di statûya penaberên siyasî de ne, ev bû çend car dibe hedefa êrîşên dewleta tirk.

Di van rojên ku hemû mirovahî di nav lepê şewba virusa koronayê de ye û bi halê xwe ketiye, hemû derd û xema dewleta tirk jî ew e ku li ku derê dibe bila bibe êşên hîn mezintir bi gelê kurd bide kişandin. Ez di wê baweriyê de me ku hemû kesên di ferqa zilm zordestiya dewleta tirk ya li hemberî gelê kurd de ne, di heman demê de di ferqa êşên dewleta tirk bi şêniyên penaberên Mexmûrê dide kişandin de ne jî.

Şêniyên wargehê di encama zextên dewleta tirk a di salên 1990'î de li ser gelê herêmê da meşandin bûn penaber. Ev penaberiya bêdilî û bi darê zorê gelek êşên mezin bi vî gelê qehreman û bi axa xwe ve girêdayî da kişandin.

Hemû kesên serpêhatiya wargeha penaberan a Mexmûrê dizanin ku ev wargeh qaşo bi statûya penaberên siyasî ve, di bin sîwana Neteweyên Yekbûyî de hatiye naskirin û parastin. Di heman demê de jî ber ku cihê wargeh lê ye ji derveyî xeta parelela 36'emîn e, li şûna hikûmeta heremî ya herêma Kurdistanê bi hikûmeta navendî ya Iraqê ve girêdayî ye. Lê zordestî û xiyaneta PDK'ê wek hercar di vir de jî sînoran nas nake û ji bo îradeya gelê wargehê bişikîne çi ji destê wan tê texsîr nakin.

Bêguman serpêhatiya penaberên wargehê ji ber bûyer û neheqiyên li ser wan hatine ferzkirin mijara roman û fîlman e. Lê mijara me êrîşên dewleta tirk ên vê dawiyê pêk hatine.

Hemû armanc û daxwaza dewleta tirk ew e ku wargeha penaberan a Mexmûrê wek wargehek PKK'ê bide naskirin û wargehê vala bike. Lê ji Neteweyên Yekbûyî bigirin heya hemû dewletên têkildarî vê mijarê dizanin ku şêniyên vê wargehê hemû sivîl in û her wiha ji derveyî sempatiyê tu eleqeya wan bi PKK'ê re nîne. Ev rastî ji hêla hemû kesan ve, bi taybet jî ji hêla PDK'ê û hikûmeta navendî ya Iraqê ve jî tê zanîn. Lê li ruxmî van rastiyan jî destur didin ku gelê wargehê bibin hedefa falabirên artêşa dewleta tirk. Ev bi serê xwe sûcê mirovahiyê ye. Bêdengiya Neteweyên Yekbûyî û dewletên navneteweyî jî tê wateya pejirandina vî sûcî.

Dema mijar dibe kurd hemû kesên qaşo aligirên mafên mirovan in ji bo berjewendiyan çavên xwe digirin. Ev jî bi qasî rastiya durûtiya van saziyan derdixe holê, her ewqas jî terora dewleta tirk a li ser gelê kurd jî deşîfre dike.

Pêwîst e gelê gurd li hemberî van lîstikên li ser wargeha penaberan a Mexmûrê tên lîstin gelê wê bi tenê nehêle. Yekîtiya gel bi hêza xwe dikare van êrîşan vala derbixe.


## MIN BERIYA MÊRDÎNÊ LI SERAD, BÊJING Û MOXILÊ XISTIYE

# Ev roman xepartinek durist e

→ Rizoyê Xerzî


Min beşek ji bîranên xwe wek romanê di Beriya Mêrdînê de daniye ber çavan. Bêguman, ev roman ne serboriya min tenê ye, serboriya piraniya nifşê min e. Şêweyeke ji şêweyên jiyana min û jiyana hevçerxên min e di Beriya Mêrdînê de... Ev pirtûka min ne romanek pexşaneyî ye, bêtir dikarim bibêjim ku xepartinek durist e ji hebûn û vejandina me xelkên Beriya Mêrdînê re

**Konê Reş kî ye?**



Konê Reş (Selmanê Osmanê Evdo) nivîskar û helbestvanê kurd e. Di sala 1953'yan de li gundê Doda yê bajarê Qamişloyê hatiye dinyayê. Heta niha derdora 20 pirtûkên wî hatine çapkirin, di nav wan de 3 pirtûkên helbestên zarokan hene û pirtûka wî ya dawî romana bi navê Beriya Mêrdînê ye.

*Me vê hejmarê berê xwe dîsa da binxetê û me berê pirsên xwe da kedkarekî din ê zimanê kurdî ku ji bajarê Qamişloyê ye. Me ji bo xwînerên xwe, ev hevpeyvîn bi nivîskar û helbestkarê kurd Konê Reş re amade kir.*



***Mamoste salên dûvedirêj tu di warên cuda ên zimanê kurdî de xebatên xwe dikî, tu dikarî çîroka xwe û destpêka nivîsandina bi zimanê kurdî ji xwendevanên Xwebûnê re bibêjî?***

Têkiliya min bi zimanê kurdî re ji gundê min Doda dest pê kir. Ev gundê ku kesî jê ne bi zimanê erebî û ne bi zimanê tirkî zanîbû. Di nav wê trajîdiya zimanî de mezin bûm, min xwend û bi giyanekî kurdperwerî hatim xwedîkirin. Gelek caran bi Seydayê Cegerxwîn re rûdiniştim. Hingî, min jî wek tevayî nifşê xwe, hin caran bi zimanê erebî dinivîsand. Carekê min jê pirsî; Seyda! Tu bi zimanê erebî an bi zimanê kurdî bêtir karî his û hestên xwe bînî der? Seyda beşişî û li min vegerand; bi kurdî. Ji wê hingê ve nivîsandina bi zimanê kurdî niqutî dilê min.

Di sala 1977'an de li Almanyaya Rojava, bi şahî çav bi rojnameya (Roja Welat) diketim, bi kurdî û tirkî bû. Piştî vegera min a Qamişlo di sala 1978'an de, min dest bi nivîsandina kurdî kir, belê di warekî biçûk de bû, ji ber ku ziman qedexe bû. Bi naskirin û çûnacem van ronakbîr û zanayên kurd: Cegerxwîn, Mele Hesenê Kurd (Hesen Hişyar), Osman Sebrî, Rewşen Bedirxan, Seydayê Tîrêj... bêtir hezkirina ziman bi min re mezin bû û kurdewarî û zimanê kurdî bi min şêrîn bûn.

***Gelo ev meseleya nasnavê Konê Reş çawa û ji ku peyda bû?***

Sebaretî nasnavê min (Konê Reş); ev nasnav, kalkê min (Ehmed), anku bavê bavê min ê ku di heyama xwe de mixtarê gundê Doda bû, wî ev nav bi wateya sexîbûn, mêranî û dilfirehbûnê li cîranê xwe Ehmedê Pitê kir. Ehmedê Pitê, mirovekî feqîr, comerd û sexî bû, deriyê wî her dem vekirî bû... Hem jî, ji zimanê kurdî pê ve bi ti zimanan nizanî bû. Mirovekî bi cil û bergên kurdî yên orjînal girêdayî bû; kum û kolozekî reş li serê wî bû. Vî mirovî gelek çîrokên kurdî yên folklorî zanîbû. Berê, ez di vî navî de diponijîm û min hezê dikir. Bijartina min ji vî navî re bi gelek wateya ye; ji rexekî ve, reşahiya ku wê demê konê xwe di ser welatê me re vegirtibû. Ji rexekî din ve, kon her dem vegirtiye. Kon, mirovan ji sermê û germê diparêze. Kon bi vegirtina xwe xuya ye, rêwî, birçî û hejar xwe lê digirin, di bin siya wî de xwe ji germê û sermê diparêzin...

***Di salên destpêka naskirina te ya bi zimanê kurdî de herî zêde bandora kê û çi li te bû?***

Roja îro ez Prof. Dr. Celîlê Celîl wek mamostayekî di warê eşq û danheva folklora kurdî de ji xwe re dibînim. Di warê nivîsandina gotaran de jî, ez ji (Tîr) ya Mûsa Anter, ewa ku di rojnameya Welat de li Stenbolê dihat weşandin û ji (Bexçe) yê Kemal Burkayî (Ferhad Can), ewa ku di rojnameya Ronahî de, ew jî li Stenbolê dihat weşandin, fêrî nivîsandina gotaran bûme. Jixwe kêfxweş dibim ku şagirtekî Mîr Celadet Bedirxan bim. Bêguman, rola navtêdana bavê min jî, di vê pêvajoyê de mezin e.

***Gelek nivîs û lêkolînên te der barê malbata Bedirxaniyan de çêbûn, tu dikarî bi kurtasî hinekî behsa rola wê malbatê bikî di wêje û zimanê kurdî de ?***

Rola Bedirxaniyan zor mezin e. Bedirxanî kurdistanî difikirîn, asoyên wan ji herêmî mezintir bûn, doza wan Kurdistanek tenê bû, ne gelek Kurdistan bûn, banga wan kurdisanî bû. Tevî ku neferên vê malbatê ji sala 1847'an ve di koçberî û sirgûniyê de dijiyan, lê wan qet welatê xwe Botan, warê bav û kalên xwe, ji bîr nekir, ji desthilanîn neketin, li ber xwe dan û gelek xebat û bizav kirin, da ku navê gelê xwe di nav gelên cîhanê de bilind bikin. Neferên vê malbatê di sirgûniyê de, di bin şert û mercên çetîn û dijwar de, xwe berpirsyarê gelê xwe didîtin û kêşeya gelê kurd barê xwe yê yekemîn dinasîn. Bi gotin û kirinê dixebitîn; çi di warê civakî û rewşenbîriyê de û çi di warê siyasî de û wiha tev di sirgûniyê de, dûrî xaka Cizîra Botan mirin her û her daxwaza wan pêşxistina gelê kurd û bilindkirina navê Kurdistanê bû. Wan Bedirxaniyan gelek komele û dibistan damezirandin, gelek kovar û rojname weşandin, hem jî bi saya wan gelek navend û enstîtu ji gelê kurd re hatine avakirin.

Neviyê Mîr Bedirxan jî, Mîr Celadet Elî Bedirxan (1893-1951), hêviyên bav û bapîrên xwe li erdê nehiştin, bi xwe re hilgirtin û hilanîn û di ber wan de xebitî ta roja dawî ji temenê xwe. Wî jî 15'ê Gulana 1932'an hejmara pêşîn ji kovara xwe (Hawar) a bi tîpên latînî, li Şamê çap kir û di nav kurd û biyanyan de belav kir. Wî jî, bi Hawara xwe, qêrîn û gaziya bav û bapîrê xwe gihand kurdan û got : "Herçî em kurd, me zimanekî delal heye û em pê diaxifin, piraniya me ji vî zimanî pê ve bi tu zimanî nizanin. Bi tenê divêt em hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin. Îro hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê mader ji bo her miletekî, êdî ne bi tenê wezîfeke şexsî ye, lê wezîfeke milî ye jî."

***Di navbera salên 1960 û 1980'yî, piştre pêvajoya ji 1980'yî heta sala 2000'î, çi guhertin di warê ziman û wêjeya kurdî de hatin kirin?***

Di navbera salên 1960-1980'yî de tu guhertinên berbiçav di warê ziman û ferhenga kurdî de, di nav kurdên Rojava de nahatin kirin. Lê tevî qedexebûna ziman, rewşenbîrên kurd li ber xwe dane, ji desthilanîn neketin. Piştî ku 14'ê hezîrana 1957'an, Partî Demokrat a Kurd li Sûriyê hatiye damezirandin, vê partiyê rojnameya Dengê Kurd bi kurdiya latînî derxistiye. Di sala 1966'an de Mele Hesenê Kurd (Hesen Hişyar) bi tena serê xwe kovarek bi navê Agahî, bi rengekî veşarî diweşand. Û di sala 1968'an de Cegerxwîn kovara Gulîstan weşandiye. Di sala 1979'an de kovara Gelawêj, sala 1983 kovara Stêr, sala 1986 kovara Xunav û sala 1989 kovara Gurzek Gul... Belê ji sala 1990'î û vir ve, hinekî çavgirtin ji çapkirina pirtûkên bi zimanê kurdî hat girtin. Di wan salan de gelek kovar û rojnameyên serbixwe û dîwanên helbestan û pirtûkên têvel ji rex nivîskaran ve hatin çapkirin û her wiha gelek kovar û rojname jî ji rex rêkxistinên kurdî ve hatin weşandin. Ew jî bi dizî û eger bihatina girtin cezayê wê mezin bû.

***Niha di jiyana me de gelek guhertin dibin û bêtir xebatên dîjîtal û online derdikevin pêş. Di van şert û mercan de gelo tu rewşa wêjeya kurdî ya îro çawa dibînî?***

Agahiyên min yên berfireh li dor xebatên dîjîtal û onlînê nînin. Bêguman sûdeya wan heye. Nexasim ji me kurdan re, lê tiştek nabe wek gotina teka teka anku a rû li rû. Belê li gor rewşa me û qedexebûna ji sed salî ve li ser zimanê me hebû gelekî baş dibînim. Derîkî nû li ber me hatiye vekirin...

***Te seydayê Cegerxwîn jî dîtibû tu dikarî behsa bîranîneke xwe ya bi seyda re bikî?***


Sebaretî pêwendiyên min bi Seydayê Cegerwîn re, wek ku min gotiye; di wan salên berî ku Seydayê Cegerxwîn di sala 1979'an de here Swêdê, ez xort bûm, min ji siya xwe re digot bi wir de here...! Devdelingê şerwalê min fireh bû, erd bi xwe re rêş dikir. Porê min dirêj û gijikî bû û cênîkê min wek potînan bûn. Her pêlekê ez û çend hevalên xwe diçûn serdana wî. Kêfa wî ji me re dihat û digot: "Kêfa min ji xort û keçan re tê. Ew ên rojên hatî ne, yên wek min xêr di me de nema ye. Û ji me re, helbestên xwe yên nû dixwendin û di nav re qala kurdan dikir; qala Mîr Celadet Bedirxan û kovara wî Hawar, Mîr Dr. Kamîran Bedirxan û rojnameya wî Roja Nû, Rewşen Bedirxan, Osman Sebrî, Dr. Nûrî Dêrsimî, Qedrî Can û di nav re dema ku gotin dihat dor stranên Şivan Perwer û helbestên wî yên ku Şivan kirine stran, digot: "Şivano hinekî kela dilê min hênik dike. Ji min xweştir dibêje."

***Tu dikarî hinekî behsa romana xwe ya Beriya Mêrdînê bikî?***

Sebaretî romana min; Beriya Mêrdînê; (Romana Heymên Derbasbûyî): Min bi vê romanê, Beriya Mêrdînê li serad, bêjing û moxilê xistiye! Dema nivîsandina vê pirtûkê min bi firehî hêviyên xwe berdan ser bîra xwe ya zaroktiyê; serwextiya xwe ya niha û bi zanebûna xwe ya îro û ezber; wek şahidê (dîdevanê) demekê ya dîroka me kurdên Cizîrê, min beşek ji bîranên xwe wek romanê di Beriya Mêrdînê de daniye ber çavan. Bêguman, ev roman ne serboriya min tenê ye, serboriya piraniya nifşê min e. Şêweyeke ji şêweyên jiyana min û jiyana hevçerxên min e di Beriya Mêrdînê de... Ev ne romanek pexşaneyî ye, bêtir dikarim bibêjim ku xepartinek durist e û ji hebûn û vejandina me xelkên Beriya Mêrdînê re.

***Peyamên te di vê rewşa nazik de bo nivîskar û rewşenbîrên kurd çi ne?***

Gotina dawî: Mixabin rêxistinên me, giringiyê nadin zimanê kurdî. Zimanê kurdî wek nasnameya hebûnê di nav gelên dinyayê de nabînin! Qîmeta zimanê me li cem wan nîn e. Mixabin jî, yên ku siyasetê dikin, naxwînin. Eger hinekî bi erebî an tirkî dixwînin jî, lê ew qet bi kurdî naxwînin! Dema ku pêşengên civakê wiha bin, gelo wê civak çawa be!!!



Mertal

SelîmTemo

# Seydayê Êşa Peyvê û Peyva Êşê

Di wêjeya Kurdî da problema sereke vebirr e, bi raya min. Em di nav nifşan de ji têkiliya bertek û şopandinê zêdetir vebirrê dibînin. Ne tenê nifşên li pey hev tên, piraniya endamên heman nifşî jî hevdu nasnekirine. Wek mînak, Berken Bereh û Arjen Arî di sala 1996an de hevdu nasîne. 17 sal piştî *Tîrêjê*…


Di wêjeya gellek zimanan de diyar e: Nifşên nûrabûyî yan li hemberî nifşên berê radibin yan têgihiştina hunerî ya nifşên berê dişopînin. Yek nûjenî ye, yek domandina nerîtê (tradition). Octavio Paz dibêje, redkirina nerîtê jî domandina nerîtê ye. Yanê herdu vebijêrk jî ayîdê heman wêjeyê ne. Lê di serdema nûjen da hemû nifşên wêjeya Kurdî bi tena serê xwe bûn. Her tiştî bi tena serê xwe û ji nû ve afirandin! Seyr e. Trajîk e, lê derfetek e jî!

Kê digot em divê nifşa berê jî daxilî nifşa 90î bikin di helbesta Kurdî da? Heke wisa bibe, ez û seydayê xwe, Berken Bereh, ji heman nifşî ne! Wek min li jorê gotî, derfetên dagirkeran û dîrokê ji me stendin, dikarin bibin derfetên me.

Dixwazim hilbijartina seydayan jî wek taybetmendiyeka wêjeya Kurdî diyar bikim. Çawa Jorge Luis Borges dibêje "her wêjekar seydayê xwe diafirîne." Yanê hilbijartina seydayê/î, helwesteka aktîv e û li "me" tê. Berken Bereh jî gotiye: *"me tu mîrate nîne bo nifşên nû / bi fikir em in keç û kurên xwe jî"*

Wek şagirtekê wî, gava berê xwe didim poetîkaya Berehî, peyv û riste min divejînin. Dixwînim, dibînim û seydayê xwe diafirînim!

Pêşiya pêşî di poetîkaya helbestkêr da em keser û zanatiya jiyanê dibinin: *"ne jiyam ji zivistanê û pê ve demsal / ev çend sal e rastî nêrgizekê nehatim."* Rastiyek niziliye ji jiyanê: *"bi deste kîjan bayî digirim / riya min bi dojehê dikeve."*



Naqîre, nake qarewar, ne bi qadan, lê bi xwe ra dipeyîve: *"hinekî lêvzuha / qiriktehl / xizan jî bûna / me nedida jiyana xwe / bi ya qralan // niha gîha jî hêşîn nayê / ji şerma xwe / çivîk hew bi tolazî difirin / û stêrk naçirûsin / li gundê me yê talankirî."*

Olanek e helbesta Berehî. Her li zarokatiya xwe digere. Li kû be vedigere welêt ku ew welat zarokatî ye: *"piştî / pênc salên nefiyê / rêwî me / ber bi welêt. mîna mindalekî çar salî."* Zarokatî keser e di poetîkaya wî da: *"ax giyanê min ê zarok / te karî her dem bibî / aşê êşa xwe." Lê dizane ku çûne, çi tiştên heyî çûne, teriqî ne, belav bûne, terkeser bûne: "esmanê nîşaneya xewnên te bû / teriqî, çû."* Her çi hebû, *"dibişirî di bêdengiya zarokatiyê de / stêrkek ma sêwî li bircên şeve."*

Li deng û bêhnên wendabûyî digere. Dibêje: *"bêhna nanê tenûrê nayê ji kolanan."* Neteweya me êdî nanê xwe çênake û naxwe. Fredric Jameson gotina "allegoriya neteweyî" (national allegory) xistiye stûyê wêjekarên ji Cîhana Sêyem. Helbet nikarim wek munkîrên famekor bi carekê red bikim. Lê dixwazim peyîva "dij-kolonyal" daynim şûnê. Kê dikare bişaftinê evqas zelal binivîse?

Seydayê peyva êşê û êşa peyvê ye. Dinivîse, disicilîne hest û tiştên mayî: *"ev demeke wisa ye / keda salekê bi xwe re bir / pirtûk reviyan taldeyên çiyayan / jiyan dîl ket / tenêtiyê kon vegirt li bajaran."* Dem diçe, dewran diçe, *"bû salek / nane me tisî / koçka me xir û xalî / cam jî şikestî ma li ser dêrî."*

Ne tenê mal, xwezaya-xwezayî û xwezaya-çêkirî jî diguhere û Bereh wêneyê wê çêdike, bi rengên gewr û zerikî: *"her tişt guherî li vir / zozana hêlîna qulingan / çemê qure û kubar / xetirêyên ku zikê şevê diqelaştin / bajarê ku maka evînê bû."*

Îca ew bi xwe li kû ye? Li vir e: *"salê daweşandin hemû pelçimên xwe / xan û kulîlk û baniyên delal li pişt çiyê man / xarên min hê jî li hewşê bela wela."*

Meriv naxwaze gotinekê dayne ber an dawiya risteyên wî.

Ruhekî şoreşger e diherike di bin risteyan ra. Lê gava di hinava serkeftinê da dimeşe pê dihese ku têk çûye: *"min digot qey rûxiyan hemû kelehên zordaran / şevê ji zû ve bar kiriye ji vî bajarî / xeşîmî hew tê bîra ferhengan."*

Hêvî li kû ye di poetikaya zanyarê êşê da? Li vir e, va dibêje: *"bajarek diherike ber bi valahiya xwe / welatek ji nû ve tê bi nav kirin."* Yan dibêje: *"li vir / wekî pêşmergeyekê ye heyat / bi her têkçûnê re / ji nû ve biltê."*

Evîn zarokatiya zarokên nû ye di helbesta wî da: *"çavên te du ewrên zarokwarî / du oqyanosên aram / her ku li min dinihêrî / biharek min dikişine nava xwe / baxçeyek tê pê ji dengen zarokan."* Herçî erotizm e, çiqas ayîdê îro be ewqas dermanê rabirdûyê ye: *"tîna lêvên te ye ey serpêhatiya qidumşikestî / dicebirîne birînên birîna min."*

Dipirse siya êşê, dibêje, *"ka te çi heye ku piştî te bêriya te bike!"* Ya ji Berken Bereh mayî û dê bimîne, axaftina bi dilî ra ye; hûrik hûrik dibare, li dor baxçeyên payîzê digere û tê li deşta êşê divenişe.

# Mifteya tenêtiyê

Mem Farqînî

Çavên min bi hesreta xewê dimirin îşev. Nizanim çi bû, çawa bû, çi qewimîbû? Ji ber çi? Lê îşev xew nakeve çavên min. Xew û çavên min wek du peravên zeryayekê ji hev dûr in. Hemû hevalên min li jor di nav ciyên xwe de radizên. Li rexmî nexweşiya zekemê, tu kes şiyar nîne. Ji xeynî min. Guhên xwe bel dikim û guhdar dikim. Dengê nalîna nexweşan jî nayê. Bêhna tevan bi awayekî balkêş li hevsengî ye: digirin û berdidin, digrin û berdidin... Dengê bêhna wan mîna dengê kesekî razayî tê min. Lê di rastiya xwe de nozdeh kes li jorê di nav lepên xewa şêrîn de ne.

Ez tenê li vir li xwarê me. Nivîsê dinivîsim. Bi rastî çi dinivîsim ez bi xwe jî nizanim. Ew ê çi derkeve halê wî jî nizanim. Lê di derengiya vê şeva bêdeng de tiştek tenê dizanim. Xwesteka nivîsê wek zeryayek bê binî pêl bi pêl mezin dibe di nav dilê min de. Min digire nav xwe û difetisîne. Niha saeta li dîwar duduyê şevê nîşan dide. Lê saeta tenêtiyê wek Çiyayê Agirîyê li ser dilê min rûniştiye. Bi hemû giraniya xwe û ez bi tena serê xwe me. Ne dengek heye ji kesî, ne jî li jor stêrka Mem û Zînê. Ez û tenêtiya xwe, xwe digvêjin. Kujer in. Û çi dibe bila bibe dixwazim vêya binivîsim.

Ev demek dirêj bû ku min tiştek nedinivîsand. Wek ku kurmê nivîsa di dilê min de bû, hatibû kuştin. Lê îşev her tişt serobino bû. Beriya vê şevê jî gelek şevan heta van çaxan di nav ciya de dimam. Heta heta wisa ku ji vê saetê derengtir jî mabûm. Lê belê tu car min wek îşev xwe tenê, bi tik û tenê hîs nedikir. Nizanim îşev çi bû ji min ?

Çi bû, gelo çi qewimî? Ji nişka ve min xwe di nav hestên tenêtiyê de dît. Niha jî li hember vê tenêtiyê şer dikim. Dinivîsim. Wê çi qas encamgir be nizanim. Lê min dil heye ku vê kerba dilê xwe biavêjim derve. Bi rastî ev çend mehên dawî min qet pênûsê negirtibû destê xwe. Helbet di vê dema derbasbûyî de çend nameyên bi darê zorê nivîsandibûn. Ez wan jî wek nivîs nahesibînim. Lê tenêtiya îşev, ev hestên îşev çawa dest pê kir nizanim.

Gelek caran min li ser tenêtiyê nivîsandibû xwedê giravî. Lê dema îşev min ev tişt di kûrahiya dilê xwe de jiya, niha xwe bi xwe dibêjim, ew hemû tiştên ku min beriya vê nivîsandibû tenê gotin bûn. Û niha di nav tenêtiya xwe de dipirpitim. Jana min nayê ziman. Ji bo vêya hevalên biwate tunene. Ji bo hestên xwe binivîsim ên hene jî têr nakin. Tu dibêjî qey erd qelişiye û hevokên di mêjiyê min de bûne tov, xwe avêtine ev erda qelişî. Xwezî min çareseriyek bidîta ji vê re.

Çend sal berê min nivîsek nivîsandibû li ser xemgîniyê. Piştî nivîsa min hevalek ji min pirsîbû, "ev çi tişt e, an çi kes e tu xemgîn kirî ?" min wê çaxê wek bersiv tenê gotibû "nizanim!". Bi rastî jî carna hin hest hene ku di derûniya meriv de ciyekî girîng ji xwe re ava dikin. Ez sebeba vê jî bi tevahî nizanim. Ma ev tiştek pir ecêb e gelo? Dibe ku, wisa be jî.

Lê niha şev dereng e. Ez li vir im. Bi tena serê xwe. Dizanim çi bikim jî ez û tenêtiya xwe, em ê îşev rû bi rû bin. Niha saet 2:15 e. Nan hat û min nan girt. Hevalek rabû ji xewa xwe ya şêrîn. Bêhna nanê germ xuya ye ku ew sermest kiriye. Niha nan dixwe. Ez jî ev rewşa wî dinivîsim. Ev kurmê xwe yê nivîsê gere bi awayekî bişikînim. Lê çawa nizanim. Xwezî min mifteya deriyê tenêtiya xwe karibûya vekira. Lê nabe. Bêhna nanê germ li pey xwe dihêlim û ber bi qata jor ve diçim. Kî dizane dibe ku îcar dayika min a xew min jî hembêz bike…

*Ji girtîgeha Rihayê



Stêrka Gelawêj



Yildiz Çakar

# "destê min bi destê yar e..."

Tu Kurdistan î, erdê te kesk û zer, ezmanê te şîn e. Şîn e hesret ji bendewariyê re. Loma sebr mîxên xwe dikirin avê, av zengar digirt. Digirt rê xwe ji waran, warwara dilê rezil dima li ber deriyê sêwiyan;

- kes diman bê kes, xurbet dibû herkes.

Pêwistiya me nebû ji wan, di dil de her mezin dibû dewsa birînan. Destê me ji hev dibûn, dibûn em macirê hemû zemanan... Zeman bi kulman xwîn dikir çavên xwe, xwe xewle dikir û xatirayan pûç dikir. Bi rim, gurz û şeşperî, xewn û xeyal dibûn xwelî.

Lêlê gidiyano! Ka zozanên jor, konên ji benikên mor. Û ew ezmanê kur? Bi ku ve çûn şopên dergûşê, yên bi morikên qor bi qor... Li ku, me ji bîr kir tasa morê ava golê. Gola şîn, çima li me niha dike şîn. Kevirê reş, kerenga beş, li jêr û jor bayê hebeş, nabêje ka li kîjan çolê dolberan xwe dike geş. Xweş e nefes! Li ser text, ban jê re dike îteat. Destê yaran li ser dêmên yaran, dilorandin ji binyadan. Yadê yadan! Çawa ket koma heft xwişkan, stêrka pîber çawa hişt deriyê gerdûnê ji taritiyan...

Fera sola me dabûn ber derî, perdên pacên me ji gulên xwe mabûn tî. Li koşk û serayên me tijî bûbûn cewrikê kûçikan. Laflafokên bi jahr xwe kiribûn dirbê dar û berên me yên bi tahm. Gul û nergîsên me bûbûn nimûne li heft welatên ecnebiyan. Biyan bûbû navên me ji lehengan. Bê mezel bû cendekên me ji qederan. Loma me digot her bihusteke ax bihuşt e ji şehîdên evîndaran. Wiha me ji xwe re gotinan digot. Weke meselokên şevan, li dora çirayên ji bêhna sorgulan. Me derew dikir stûyê xwe, xwe bi cilên stûr û me mêşê dikir mêşa gebgebe. Du çipiskên baranê xwe li erdê xista, me ji bi dizî tofanê radikir ji kîsê xwedê. Em baskokî bûn, refên me winda. Loma qedera me derdixistin ser mazatan. Jê re digotin bazara xenîmetan. Ka kê diye, sî roja xwe firotiye?

Difirotin gulên dilan, li ser textên namerdan. Bila kes nebêje evîna delalan li min helal e!

-eşqa delaliyan nabe helal ji kurtêlxwaran re.

Loma digotin, bextê çil ro çilê tune ye, ji rehma şevan re xew qet tune ye. Ji efsûnbazên deriyan re sekin û deyax, ji birîna dil û ji hespên kulek re çare tune ye... Tune ye bext ji text. Giriyên eşqê her mişext e. Naqede meraqa dilan, dil radibe mîna behran. Kes bi qasî delalan nizane. Çiqas xweş e xew, dema dibêje ew;

-destê min bi destê yar e!

Tu Kurdistan î, erdê te kesk û zer, asîmanê te şîn e. Şîn e dûrî ji sewdayan. Loma hezkirin mîxê xwe dikir avê, av zengar digirt; lê hezkirin her weke xwe dima çav şîl û ser bilind, dima kevne zeman li ber delaliyan;

-radimûsim axa bin lingên te, ya ku Kurdistanek li min dihewîne...

Aborî û Civak
Ramazan Tunç




# Piyaseya Hirçê û slumpflasyon

Fona Pereyî ya Cîhanê (IMF) û Banqeya Cîhanê du saziyên ku piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn ji bo pergala pere û fînansê ya navneteweyî saz bikin, hatine avakirin. Ji vê pergalê re tê gotin Pergala Bretton Woods an jî wek saziyên cêwî yên Bretton Woodsê tên binavkirin. Li gor Peymana Bretton Woodsê (1944) hemû pereyên cîhanê bi dolarê Amerîkayê ve hatin girêdan û dolarê amerîkî bû tekane pere ku li hemberî zêr bi nirxekî westar (sabît) bê qebûlkirin. Li gor vê peymanê onsek zêr (1 Ons=31.10 gr) wek 35 dolarê amerîkî qebûl kirin. Peymana Bretton Woodsê di heman demê de destpêka kadîbûna (globalbûna) pergala fînansê û pere ye jî. Peywirên van saziyên cewî ew in, ku hevsengî û aramiya piyaseyê bidin rûniştandin. Ji bo rewşa pergalê her sal, salê du caran di mehên nîsan û cotmehê de IMF raportên rewşa welatan amade dike, li gor nîşaneyên (indikator) makro û darayî nirxandinan li ser pêşveçûyîna aborî û dahata welatan dike. Carinan jî hişyarî dide welatên ku rewşa wan ber bi başbûnê ve naçe. Rêveberiyên welatan der barê hevsnenga darayî, piyase, budçeyê, rêjeya ribayê (faîz) û rêjeya pereguherînê (Exchange rate) de şiyar dike.

Li gor nîşane û texmînên IMF'ê, Dahata Neteweyî ya Giştî (DNG) ya Tirkiyeyê di sala 2020'an de wê ji %5 dakeve û enflasyon jî wê li derdora %18'an be. Li gor raporta meha cotmeha 2019'an texmîna rêjaya zêdebûnê %3 bû. A niha tê wê menayê aboriya Tirkiyeyê wê ji %8 tengav bibe. Ev tengavbûn nêzikî 60 bilyon (milyar) dolarî ye. Texmînên IMF'ê gelekî girîng in, ji ber ku biryardarên rêvebirina karan, fabrîkayan, karsaz, karker û zihakar di piyaseyê de li wê gorê tevdîrên xwe werdigirin û biryarên xwe didin. Li gor pîvanên aborî û fînansê, erge li welatekî DNG kêm bibe û enflasyon jî pê re zêdê bibe, jê re "Slumpflasyon" tê gotin. Rewşa aboriya Tirkiyeyê ne tenê ku IMF'ê ji bo sala 2020'an tesbît kiriye lê belê ji bo sala 2021'î jî xuya ye, ku wê di nav slumpflasyoneke kûr re derbas bibe. Ji ber ku têsîrên şokê li gor dîtaneya derengî (lag) Granger (ceribandina sedemî û lag) û Posner (zarîkirina derengiya bazirganiyê) li ser hinek îndîkatoran test kirine, 3 an jî 4 demsal didomin. Halbûkî li gor armanc û hedefên 2023'yan ên sedsaliya cimûriyetê û li gor Plana 10'emîn a Pêşveçûnê ku di dema vê hikûmeta desthildar de hatiye amadekirin, di 2023'yan de DNG'ya Tirkiyeyê pêwîst bû ku ji 2 trilion dolarê amerîkî derbas bûbûya. Li gor vê hejmarê ew ê ji DNG'ê serê kesekî 25 hezar dolarê Amerîkî bikete. Ew plansazî bi tevahî hilweşiya û a niha van salên pêşiya me xuya dike wê salên darbendiyê, tunebûnê, qeyran û desttengiyê bin.

Partiya desthildar a Tirkiyeyê wexta di 2002'yan de hêza piraniya parlamentoyê bi dest xist, bi piştgiriya Yekîtiya Ewropayê (YE) û sererastkirina aboriyê li gor prensîbên IMF'ê, Krîterên Maestricht û Baselê yên pergala fînansê, banka û rewşa darayî ji nû ve nirxandin û dest bi reforman kirin. Di 5 salên pêşîn ên desthilatdariya xwe de plansaziya 2009 û 2014'an, Plana 10'emîn a Pêşveçûnê amade kir. Li gor pîvan û reformên YE'yê hewl dan ku civak jî û aborî jî pêşve here û ji derveyî nijadperestên jakoben hemû derdorên civakî piştgirî dan vê pêvajoyê. Di 2010'an de referandûma ku hêza desthilatdariyê ji bo reforman zêde kir, hêvî da piyaseyê. Di 2014'an de şerê DAIŞ'ê dest pê kir û di heman demê de hewldana ji bo rejîma serokatiyê jî dest pê kir û hilbijartinên hezîrana 2015'an ji bo demokrasiyê, serdestiya hiqûqê û piyaseya ku bi hêviyên baş bi rê ve diçe, hêviyeke mezin çêkirin. Piştî ku hilbijartin betal bûn û şûnde tofan û qiyamet rabû. Desthildarî ji bo hêza xwe biparêza agir bi reforman xist, demokrasî û serdestiya hiqûqê ya ku jixwe li Tirkiyeyê kor û topal bû, berê xistin cemedxanê, di dawiyê da jî agir pêxistin û şewitandin. Di 2017'an de rejîma Tirkiyeyê guherî û hêza teknokratên ku aborî, fînans û dezgehên darayî yên dewletê bi rê ve dibirin, hat tunekirin, kesên ku li dijî grubeke kleptokrat dengê xwe yê muxalefetê bilind kirin, hatin tasfiyekirin. Hewldana darbeyê ya 2016'an derfet da desthildariyê ku hemû saziyan têxe bin reveberiya komeke biçûk. Di nav vê gêjgerînekê de piyaseyan hêviyên xwe wenda kirin, kêmhêvîbûnê hevsenga piyaseyan xera kir û di tebaxa 2018'an de krîza (qeyrana) nirxê pereguherînê li piyaseya Tirkiyeyê xist. Li şûna ku desthilatdar pêşiyê li qeyranan bigire, mafê axaftinê qedexe kir û hêz û çavkaniyên bankeya navend daxistin û ziha kirin. Piştî ku pêvajoya hevdîtina bi Îmraliyê re hat astengkirin, di 5'ê nîsana 2015'an de rêzaniyên (polîtîkayên) şer li ser budçeyê giraniyeke mezin çêkir. DNG'ya Tirkiyeyê di 2019'an de daket 740 biliyon dolarî. Rêjeya dolar û TL ji bi qasî 3 katan zêde bû, rêjeya pereguherînê ji bo dolarê amerîkî ji derdora 2.5 TL'î derket derdora 7 TL'an. Yanî li gor 5 sal berê, hêza welatiyan û dahat, serê kesê ji 3 qatan zêdetir daket.




A niha jî li derdora 730 biliyon dolarî ye û li gor texminên IMF'ê piştî krîza şewba Covid-19'ê di 2020'an de ew ê slumplflasyon çêbibe, him DNG kêm bibe û him jî enflasyon zêde bibe. Di vê pêvajoyê de polîtîkayên aramiyê tenê ji bo komeke biçûk tên amadekirin û welatî di bin barê qeyranê de dimînîn.




Di sala 1944'an de wexta ku IMF tê damezrandin, 1 ons zêr 35 dolar e. A niha 1 ons zêr di piyaseya cîhanê ya serbest a spot de gişhîşt 1740 dolarî. Her çiqas qeyrana Covid-19'ê li ser piyaseya kadî tevahî bandor kiribe jî, şewba Covid-19'ê wek tofanekê li piyaseyê tesîr kir, ji ber kadîbûnê çawa sermiyan û kar, danûstandina mal û xizmetan di nav welatan de azad pêk tê, nexweşîn û şok jî welat bi welat digerin. Ruhê krîzên pergalê jî di nav vê geremolê de xwe roj bi roj zêde dide nîşandan.



Piştî qeyrana 2008'an ku li Amerikayê dest pê kir û belav bû, aborînasên Amerîkayê yên bi nav û deng ên wek Joseph Stiglitz, Oliver Blanchard, David Romer, George Akerlof wek lijneyeke edîtoryal di bin navê "Qeyranê Çi Ferî Me Kir" de bi kurahî rewş nirxandin û di der barê polîtîkayên makro yên aboriyê de pêşniyazên xwe nivîsandin. Di wê demê de aborînas Alan Greenspan ku di der barê aboriyê de pirtûka bi navê "Serberjêrçûyîna Serbest" nivîsandiye û bi nîşaneyên makro rêjeya pereguherînê, riba-faîz û pergala navneteweyî dinirxîne û tîne ziman, ku wexta nîşane serberjêr dibin, pêşîlêgirtin gelek zor dibe û ji bo pêşîlêgirtinê rêzaniyên heterodoks pêwîst in, saziyên xurt dikarin pêşiyê li serberjêrçûyînê bigirin. Li cihê ku Tirkiye sazî û çavkaniyên xwe xurt bike, kes xurt kirin û hundirê saziyan vala kirin, lê mijiyan, berê çavkaniyan dan nav satarên taxa komekî ku tevna pola nepotîzm û kleptokrasiyê de ne.

Piştî 2015'an rewşa rêvebirina aboriya Tirkiyeyê jî xera bû. Di referandûma 2017'an de jî ev xerabûn jî bo pergaleke navendî dest pê kir. Vê pergala navendî fonek damezirand, ku navê wê jî Fona Hebûniya Tirkiyeyê (Turkey Wealth Fund) danîn û şirîkatiyên wek Ziraat Bankası, Halkbank, Borsa Istanbul, Turk Telekom, THY, PTT, TURKSAT, BOTAŞ, Eti Maden û Çaykur di bin sîwana vê fonê de hatin komkirin. Bi piranî fonên wiha ji ber ku di welatên dewlemend de zêdehiyên bazirganiyê derdikevin, tên damezirandin. Li Tirkiyeyê ev zêde nîn e, ji ber ku Tirkiye di warê bazirganiyê de tim deyndar e, kêmasiyên bazirganiyê hene. Ji ber ku çavkaniyên Bankeya Navend a Cimûriyetê nemane, vê fona hanê jî wek Bankeya Navend ji bo ku ji piyaseyê re pere bibînin, tê bikaranîn. Ev fon jî a niha betal e û nikare bê bikaranîn. Piştî ku rejîmê hukmê xwe xurt kir, ji bo bûrjûvaya nêzî xwe ava bike, berê çavkaniyên dewletê dan şîrketên mezin ên ku di nav wan tevnên kleptokrasiyê de ne. A niha jî tenê fona bêkariyê heye, ku mezinahiya wê li derdora 20 bilyon dolarî ye. Lê mixabin ji ber ku di vê pergala navendî de serdestiya hiqûqê, zelalî û hesabdayîn nîn e, ev budçe di ku derê de tê xerckirin ne diyar e. Bi piranî ev fon ji berîka karkeran û xebatkaran derdikeve lê wisa xuya ye, di nav vê şêlûbûnê de tevnên kleptokrasiyê dest didin ser van fonên ku bi ked û xweydana eniya welatiyan hatiye berhevkirin. Ji bo demên ku senedên parên şirîkatiyan û hemû îndikatorên piyaseya fînansê dadikevin, di zimanê guhertingehê de "Piyaseya Hirçê" tê bikaranîn. Wisa xuya ye ku piyaseya hirçê li hemû cîhanê ji ber Covid-19'ê dest pê kir. Di nav vê tevlihevî û qelqeleyê de li Tirkiyeyê jî qeyrana Covid-19'ê li piyaseyê xist. Rez ji xwe ne tu rez bû, hirçê jî lê xist.

**Slumpflasyon:** Di zimanê piyaseyê de wexta ku buhabûna mal û xizmetan û kêmbûna dahatê bi hev re derdikevin holê û hevsenga piyaseyan xerab dikin, tê bikaranîn.
**Zêdeya bazirganiyê (Trade Surplus-Ticaret Fazlası):** Pîvana hevsenga di nav bazirganiya dervefrotin û dervestandinê (hinarde û hawirde) de ye. Ku dervefrotin (îxracat) jidervestendinê (îtalat) derbas bibe, ev zêde dertê holê. Hevsenga Bazirganiyê = Dervefrotin-Jidervestendin
**Piyaseya hirç û ga:** Di zimanê piyaseyan de wexta piyase serberjêr dibe û reşbînî hebe, jê re tê gotin piyaseya hirçê, ji ber ku napirkên hirçê serberjêr in, wexta piyase hêvîdar dibe xweşbînî hebe, guhertingehên senedan û endeks ber bi jor ve diçin, berejor dibin, jê re tê gotin piyaseya ga, ji ber ku qiloçên ga serê wan berjor in.

## Gotinek ji gotinên pêşiyên me

**Rez ji xwe ne tu rez bû teyrokê jî lê da:** Ji bo rewşên ku ne baş in û bi ser de jî tofaneke xwezayî yan jî çewtiyeke bi destê mirovan bi ser de tê, tê bikaranîn.

# Daneyên rast tên veşartin

Navenda Nûçeyan

Vîrusa koronayê ji kanûna sala 2019'an rojeva sereke ya cîhanê ye. Her roj der barê vîrusê de daneyên nû tên parvekirin. Gelek welat der barê rewşê de hewl didin tabloyeke erênî nîşan bidin û rastiya heyî veşêrin.

Ji ber vîrusa koronayê li seranserê cîhanê rewşeke aloz, xeternak û pêşerojeke ne diyar heye. Ji aliyek ve zanyar bal dikişînin ser rewşa xeternak û banga zêdekirina tedbîran dikin; li aliyê din jî rayedarên dewlatan dibêjin rewş êdî asayî ye û di bin kontrolê de ye. Lê tabloya ku derketiye holê nîşan dide ku vîrus bi her awayî bandorê li jiyanê dike.


Vîrusa koronayê ya ji Çînê belavî hemû cîhanê bû û bû sedema mirina bi hezaran kesan, di serî de Çîn û li hinek welatên din hejmara kesên bi vîrusê dikevin kêm dibe. Hêdî hêdî tedbîrên hişk tên sistkirin û karantîna tên rakirin. Almanya hewl dide ku biryarên di 22'yê adarê de girtî bi gav bi gav sist bike û li Rûsyayê jî ji bo derketina derve dê destûr bê wergirtin. Ji 16'ê adarê heta niha li Swîsreyê jî rewşa awarte hatibû ragihandin û dê ji 27'ê nîsanê şûnde jî bi sê qonaxan tedbîr bên sistkirin.

**Divê tevdîr neyên sistkirin!**

Epîdemiyolog Ben Cowling ê zanîngeha Hong Kongê hişyariyeke krîtîk kir û got: "Eger tedbîr bên sistkirin, dê pêla duyemîn a vîrusê pêk bê. Kîjan welat tedbîran sist bike, dê vîrus li wî welatî bixe. Tedbîrên hatine girtin divê heta meha hezîran û tîrmehê neyên sistkirin."

**Li Tirkiyeyê zêde dibe**

Berdevkê Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) Dr. Margaret Harrîs, li Cenevreyê têkildarî hejmara pêketiyên vîrusa koronayê daxuyaniyek da û diyar kir ku hejmara pêketiyên vîrusa koronayê li hin deverên Ewropayê kêm dibe, lê li Îngilistan û Tirkiyeyê jî zêde dibe û Enqere jî daneyên vîrusê vedişêre.



Vîrusa koronayê li her qada jiyanê bi bandor bûye, lê rayedarên gelek dewletan rastiya heyî vedişêrin û tabloyeke serkeftî û erênî ji raya giştî re radigihînin

**Mafên penaberan tên binpêkirin**

Bi belavbûna vîrusê re penaber jî hatin jibîrkirin. Li welatên vîrus heye penaber bêtir mexdûr dibin, bi cihêkariyê re rûbirû dimînin û metirsiya li ser wan hîn zêde ye. Ji ber vîrusê welatiyên Çînê bi mehan li gelemperiya cîhanê bûn hedefa cihêkariyê, lê li Çînê jî êrîşên nijadperest li afrîkiyan tê kirin. Li giravên Yewnanistanê jî metirsiya mirinê li ser bi hezaran penaberan heye. Koordînasyona Antî-Koronayê ya Ewropayê bal kişand ser rewşa hemû penaberan û diyar kir vîrus herî zêde bi awayên cuda bandorê li ser penaberan dike. Koordînasyonê ji bo penaberan çend pêşniyar jî kirin û got: "Wekî Portekîzê divê mafê welatiyan bi wekhevî bidin hemû penaberên li Ewropayê, lê divê demek ji bo vê neyê diyarkirin. Di pêvajoya vîrusê de divê hemû penaber ji xizmetên tenduristiyê bê pere sûdê bigirin. Penaberên ji bo dersînorkirinê hatine girtin divê serbest bên berdan û mafê wan ê rûniştinê bê qebûlkirin. Di serî de ji bo jin û zarokan zad û malzemeyên hijyenê bê pere bên dayîn."

**Alîkarî hat rawestandin**

Beriya hefteyekê serokê Amerîkayê Donald Trump ragihand ku wan alîkariya pere ya ji bo WHO'yê rawestandiye. Trump, WHO'yê bi mirina hezaran kesan tawanbar kir û li gorî wî, Rêxistinê tu girîngî nedaye rêbazên giştî yên li dijî vîrusê. Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Antonio Guterres jî biryara Trump rexne kir û da zanîn ku biryara rawestandina alîkariyê, ne di cih de ye.

**Geşedanên dawî...**

Mijar û geşedanên ku mohra xwe li vê hefteyê xistin jî wiha ne; li Eyaleta Michigan a Amerîkayê komeke rastgir çek girtin û li dijî tedbîrên hatine girtin çalakî li dar xistin û her wiha koma rastgir wêneyên Donald Trump jî di çalakiyê de hilgirtin. Neteweyên Yekbûyê (YE) da zanîn ku Yemen nikare hem bi şer û hem jî bi vîrusê re têbikoşe. Ji ber nîqaşên vîrusê serokdewletê Brezîlyayê, wezîrê tenduristiyê ji kar dûr xist. Hikûmeta Japonyayê piştî zêdebûna pêketiyên vîrusê rewşa awarte ragihand. Li Koreya Başur tevî vîrusê hilbijartina giştî pêk hat. Li Portekîzê 2 hezar girtî serbet tên berdan. Fransa ji bo tedawiya vîrusê derfeta kar da bijîşkên biyanî yên ji derveyî Yekîtiya Ewropayê hatine.

## Jin û zarok nayên parastin

Li dijî belavbûna vîrusê gelek welat tedbîrên cuda girtin, lê belê di nav tedbîran de parastina jin û zarokan tune ye. Di vê pêvajoyê şîdet û êrîşên li jin û zarokan zêdetir bûn. Komîsyona Jinan a Neteweyên Yekbûyî di pêvajoya vîrusê de der barê şîdeta li jinan de raporek amade kir û li gorî raporê li tevahiya cîhanê şîdeta li jinê zêde bûye. Di raporê de hat destnîşankirin ku di pêvajoya koronayê de li Fransayê ji sedî 30, li Arjantînê ji sedî 25, li Kibrisê ji sedî 33 û li Kanada, Almanya, Îspanya û Amerîkayê jî şîdeta li jinê zêde bûye. Li gorî raporê îzolasyona fizîkî jî bûye sedema zêdebûna şîdetê û gelek sazî û dezgeh ji ber vîrusê bersiv nedane bangewaziya jinan.

Her wiha yek ji mijarên herî girîng jî rewşa zarokan e. Li gorî Fona Alîkariya Bo Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (UNICEF) ji ber girtina dibistanan milyar û nîv zarok niha li malê ne û tevahiya dema xwe bi înternetê derbas dikin, ev tişt ji bo zarokan metirsiyeke mezin e. Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyê Antonîo Guterres der barê rewşa zarokan de raporek aşkera kir û got: "Ji ber vîrusê zarok baş nayên xwedîkirin û bi şîdeta malbatê re rûbirû dimînin. Ji ber krîza aborî ya gerdûnî jî dibe ku bi sedhezaran zarok ji ber xwedîkirina ne baş jiyana xwe ji dest bidin."

## Mirov vekişiyan malan, heywan daketin qadan

Li dijî belavbûna vîrusa koronayê niha li cîhanê bi milyonan mirov li malên xwe dimînin û dixwazin xwe ji vîrusê biparêzin. Gelek bajar, cade û kolan vala man. Ji Parîsê heta Dêrsimê gelek heywan daketin kuçe û kolanan. Her wiha dengê cûkan zêdetir bûn û hewaya gelek bajarên mezin jî paqij bû.

Li Dêrsimê ji ber ku park û baxçe vala man, pezkovî bi keriyan daketin qadan. Li Parîsê jî werdek ji parkan derketin û daketin qadan. Li herêma Valde Marne ya Fransayê jî du xezal daketin bajêr. Li welatê Galê jî bizin li ser peyarêyan geriyan. Li Îspanyayê teyrên tawis ji ser dîwarê parka Retîro ketin navenda paytextê. Li kolanên Lophûriya Taylandê jî meymûn ketin kolanan. Li Japonyayê xezal li kolanan belav bûn. Li bajarê Barselonaya Katalonyayê jî beraz li kolanan peyase kirin. Li bajarê Chîcacoya Amerîkayê akvaryûma Sheddê deriyê xwe ji ziyaretvanan re girt û penguen li nava avahiyê geriyan. Li West Odaklana Kalîforniyayê jî elok li nev bajêr geriyan. Li Santîagoyêya paytexta Şîliyê, pûmayekî ciwan hat dîtin.



Mem Avba

## Xefika Zînî Wertê!

Di demeke hewldan û daxwazên Yekîtiya Neteweyî (YE) di rojevê de ne, li başûrê Kurdistanê geşedanên balkêş diqewimin. Jixwe şewba vîrusa koronayê, mîna li tevahiya cîhanê bandoreke neyînî li welêt jî kiriye. Gelê kurd, ligel tevahiya nakokî û rageşiyên rêxistin û partiyan, xwedî helwesta yekîtiya neteweyî ye. Ji hêzên pêşeng ên kurdistanî bendewar e ku gavan bavêjin. Lê belê halê hazir wisa diyar e ku hêz û rêxistinên kurdî ji vê nêzikatiya çêker dûr in!

Lewma neyar û xêrnexwazên gelê kurd jî dixwazin vê tengezariya ji ber vîrusa koronayê derketî holê, ji bo berjewendiyên xwe bi kar bînin û daxwazên xwe yên dagirkeriyê bidin ferzkirin. Ji bo wê ye ku dixwazin nakokiyan di nav hêzên kurdî de derînin. Bi vî awayî keysa xwe lê bînin û xeyalên xwe yên sedsalî, dagirkirina Kurdistanê pêk bînin.

Di demeke wiha de ku pêwîstiya gel bi yekîtî û tevkariyê heye, geşkirina nakokî û rageşiyên ku xizmeta dagirkeran dikin, tevahiya gelê kurd dilgiran dike. Lewre gelê kurd li bendê ye ku hêz, sazî û dezgehên pêşeng ên li ser navê kurd û Kurdistanê xwedî angaşt û gotin in, yekrêziya xwe pêk bînin û ji civaka xwe re çareseriyekî pêş bixin.

Lê mixabin di van rojên dawî de berovajiyê vê, geşendanên li başûrê Kurdistanê diqewimin, gel dixe nav fikar û xemgîniyeke mezin. Tevahiya gelê kurd, statuya başûrê Kurdistanê bi şanazî û serbilindiyeke mezin weke destkeftiya xwe dibîne û xwedî lê derdikeve. Lewre bendewariyeke mezin a ji bo yekîtiya neteweyî û çareseriyê jê heye. Lê mixabin bûyer û rageşiya li ser herêma ***'Zînî Wertê'*** ya başûrê Kurdistanê diqewime, mirov dixe nav fikarên kûr ka li vê derê, sê hêzên sereke yên kurdistanî çima tên hemberî hev!?

Bêguman heke di navbera her du hizbên başûrê Kurdistanê (PDK û YNK) de kêşeyek hebe, divê li parlamentoya Kurdistanê bi nîqaş û diyalogê çareser bikin. Heke pirsgirêkeke ewlehiyê hebe, li vê herêmê hêzeke kurdî heye û Wezareta Pêşmerge ya hikûmeta Kurdistanê dikare bi hevbeşî bi hêzên gerîla re li ser vê mijarê bisekine û çareseriyê pêk bîne.

Lê heke hesabekî cuda hebe ku hêzên kurdî tîne beranberî hev û balafirên dewleta tirk herêmê bomberdiman dike; ev jî dibe sedama kuştin û hilweşînê, wê demê divê li ser bê fikirandin.

Ev herêm devereke ku bi rojhilatê Kurdistan û Îranê re hevsînor e. Lewre heke pirsgirêkeke ewlehiyê çêbibe, bi dewleta Îranê re çêdibe. Di rewşa niha ya hevsengiya Rojhilata Navîn de, qeyrana aborî, tenduristî, ambargoya li ser heyî, pir pêkan nîne ku Îran bikeve nav hewldanake wiha. Heke tişteke wiha biqewime jî hêzên gerîla bi salan e li vê deverê ye û bi dehan caran nîşan daye ku jî kê bê bila bê li hemberî êrîşan bê cudatî bergirî kiriye û destkeftiyên gel parastine. Ji daxuyaniyan jî diyar e ku dê ji niha û pê de jî bibin xwedî heman nêzikatiyê. Lewma gerîla ji bo gel û destkeftiyên başûrê Kurdistanê jî ewlehî û hêza parastinê ye. Ev faktor jî nîşan didin ku tu metirsiyeke wiha ya ji aliyê Îranê ve li ser wê herêmê tune…

Nexwe şandina Pêşmerge ya bo herêmê ji bo parastina welatiyên herêmê û rêkarên ji bo pêşîlêgirtina vîrusa koronayê be, li herêma Zînî Wertê hêzên polîs, asayîş, dezgehên îdarî û parastinê hene. Lewre tu hewcehî namîne ku hejmareke zêde ya peşmergeyan bi çekên giran biçin herêmê. Nexasim ku her alî (PDK cuda, YNK cuda) hêzên pêşmerge bi çekên giran bişîne herêmê. Lewma ev vebijark jî gengaz naxuyê!


Divêtiya ditir, asûna çiyayê Karoxê ku xwedî cihekî stratejîk ê li ser herêma Qendîlê ye. Lewre weke gelek siyasetmedarên başûrê Kurdistanê jî diyar kirin, li pişt vê rageşiyê, plangeriyên dewleta tirk ên dagirkeriyê hene. Çawa ku par, li herêma Xinêre-Xakurkê bi çavgirtin û asankariya hinek aliyan, dewleta tirk êriş kir û xwest çûn û hatina Hêzên Parastina Gel asteng bike, niha jî li Zînî Wertê dixwaze bi heman plangeriyê li ser çiyayê Karoxê jî pêk bîne û herêma Qendîlê dagir bike.

Ji bo ku nikare bi aşkera vê armanca xwe pêk bîne, dixwaze nakokiyên di navbera aliyên hikûmeta herêma Kurdistanê de bi kar bîne. Ji bo ku li herêma Kurdistanê sazûmaniyeke tekûz a hikûmetê çênebûye, dîsa ji ber valatiya qeyrana aborî û bêkariya heyî, belavbûna nexweşiya vîrusa koronayê; nexasim jî di vê dema ku hikûmta navendî ya Iraqê dixwaze serokwezîrekî nû hilbijêre de, dewleta tirk jî dixwaze ji bo hesab û berjewendiyên xwe bi kar bîne.

Di serî de Başûr, tevahiya gelê Kurdistanê divê baş bizane ku ev bûyer û rageşiyên li herêma Zînî Wertê diqewimin, rojeveke sexte ya ji aliyê dewleta tirk ve ji bo dagirkirina herêmê û tesfiyekirina Tevgera Azadiya Kurdistanê ye. Ji bo wê jî divê gelê kurd bi yek helwestê li dijî vê hewldana dagirkeriyê, li hemberî rageşiya di navbera hêzên kurdî de bisekine û bibe xwedî helwest.

# Ji civaka me jineke awarte:

# Eyşoya Dîn



Roşan Lezgîn

Nivîsandin awayê herî biserûber yê îfadekirinê ye, lê esas nivîsandin qeydkirin e. Çi dibe bila bibe, eger tiştek bi awayê nivîskî qeyd nebe, daxilê tarîxê jî nabe. Tarîx jî, helbet tenê ew nîne ku wextê çêbûna bûyerekê nîşan dide, yan jî, behsa bûyerên mezin ên miletekî dike. Tarîx, ji vana gelek zêdetir e; bi întîzam tesbîtkirin, qeydkirin û neqilkirina tecrubeyên şexsî û civakî ye; hafiza ye. Lê çi heyf ku ji vî alî ve, ji ber ku di nav miletê me de kultura xwendin û nivîsandinê gelek kêm e, hafizaya me ya civakî jî gelek zeîf e. Bo nimûne, ez ê niha ji nav miletê me wek tîp behsa jinekê bikim ku ji vir heta pêncî sal berê gelek navdar bû, lê neslê nuh jê agadar nîne. Eger niha behsa wê nebe, neyê nivîsîn û qeyd nebe, her wekî ku tune bû, dê winda bibe here. Yanî, ez ê behsa "Eyşoya Dîn" bikim ku zemanek li herêma Licê gotinên wê yên aforîzmatîk di eyara gotinên pêşiyan de rê nîşanê gel didan ku ew jî bi van gotinên xwe yên felsefîk ji nav miletê me tîpeke orîjînal bû.

Tê bîra min, berîya sala 1975'an, li herêma Licê navê Eyşoya Dîn menşûr bû. Mesela, xelqê dema tiştek bigota, di nav re digot "Eyşoya Dîn bîlasebeb nabêje 'Xelqê ra dixtor im, ji xwu ra kor im'." Ez ê li jêr lîsteyek ji gotinên xas yên Eyşoya Dîn bidim ku ji vir çil-pêncî sal berê li herêma Licê di nav gelê me de menşûr bûn, lê ez dixwazim pêşî behsa jiyana wê bikim.

Li navenda Licê, ji ber îhtîramê jê re digotin "Xaltîya Eyşo" lêbelê ji ber ku bi gotinên xwe, bi xeberdana xwe, bi lixwekirina xwe, bi hal û tevgera xwe ji jinên edetî yên wê demê cihê bû, yanî ji ber ku jineka awarte bû, lewra zêdetir bi navê "Eyşoya Dîn" navdar bû. Ev "dînîtî"ya ku jê re bûye sifet, ji bo wê esas di manaya "jîrîtî"yê de ye.

Eyşoya Dîn ji Xincisê, qîza Mehemedê Derwêş e. Xincis, li alîyê rojavayê Licêya jorîn ku di erdheja 6'ê îlon 1975'an de xira bû dima. Newalek gund ji navenda bajêr vediqetîne. Ji pira ku li ser vê newalê bû re digotin "Pira Xincisê." Bi navê Hecî Reşîtê Dikandar û Xelîl du birayên wê hebûn. Di qeyda dewleta tirkan de paşnavê wan "Kaynak" e. Eyşo li gundê xwe bi Elîyê Emo re dizewice, lê hîn bûka sê salan bûye ku mêrê wê rehmet dike. Elîyê Emo bi eslê xwe kird e, malbata wan ji herêma Dimilîyan hatiye, li Xincisê bi cih û war bûye. Bi navê Mehmûd zarokekî lawîn ji xaltîya Eyşo û Elîyê Emo hebûye. Ev Mehmûd di sala 1917'an de hatiye dinê. Lewre meriv dikare texmîn bike ku Xaltîya Eyşo teqrîben di sala 1900'î de hatiye dinê. Çimkî li gorî edetên wê demê qîz sêzdeh-çardeh salî dihatin zewicandin.

> 'Dînîtîya çi? Ew ji me hemîyan biaqiltir bû. Xwe li dînîtîyê danî ku bikaribe xwe biparêze!' Xuya ye, piştî zewaca xwe ya duduyan êdî nexwestiye bizewice

Piştî mirina mêrê xwe, ku wisa bûka teze tevî zarokek sêwî bî dimîne, herwisa ji ber şertên jiyana wê demê, trawmayeka giran derbas dike. Ji ber ponijîna kûr hişê wê piçek tevlihev dibe, wê hingê sifetê "dîn"bûnê lê dikin. Yanî, ji ber ku trawma derbas kiriye, jê re gotine dîn. Di eslê xwe de dînîtî pê re tune bûye.

Xaltîya Eyşo deh sal piştî mirina mêrê xwe yê pêşî, li navenda Licê, li Mehlaya Çarşîyê bi yekî din re dizewice. Ji vê zewaca wê jî kur û keçek çêdibin. Navê kurê wê Evdirehman, navê keça wê jî Emîne ye. Vî kurê wê demeka dirêj li Hepisxaneya Diyarbekirê qerdîyantî kiriye û heta ku bûye serqerdîyan (başgardîyan). Di dawîya emrê xwe li mala vî kurê xwe maye lewma li Diyarbekir di roja 18.01.1979'an de çûye rehmetê. Ev gotina wê ya navdar ku dibêje 'Xelqê jin anîye, Edoyê mi jan anîye!" li Diyarbekir, di dawîya emrê xwe de gotiye.

Kek Bayram Ayazî derheqê Eyşoya Dîn de gelek agahî dan: "Mala wê li alîyê Mehla Kortikê bû. Ew gotina wê ya menşûr ku dibêje 'Xelkê mêr kir, min mor kir' li ser xwe dibêje. Ji ber ku piştî mirina mêrê xwe yê duduyan wek jineka ciwan li ser zarokên xwe dimîne, mêr nake. Lê xelqê Licê ev gotin bi manaya mecazî bi kar dianî. Tê bîra min, dawîya salên şêstî bû, dihat mala me. Rehmetîya dêya min qedrê wê digirt, eger zekat bûya yan wek xêr û sedeqe bûya, alîkarîya wê dikir. Mala du xwuşkên min li Mehla Kortikê bû, diçû mala wan jî. Dada Asêya bûka xaltiya Eyşo, yanî jina birayê wê Xelîlê Xincisî berê damarîya min bûye. Yanî, dêya her sê xwuşkên min ên mezin bû ku mala duduyan jê li Mehlaya Kortikê bû. Xaltîya Eyşo ew ji malê dihesiband. Carînan ji mala xwe, ji serê wî alîyê Licê derdiket, bi meş heta Xincisê diçû. Mal yan jinên ku wê ew nas dikirin, xwe li wan digirt, diçû cem wan. Min gelek car ew dîtiye. Hafizaya wê xurt bû, me hemîyan bi nav nas dikir. Ji min re digot 'Layê Ribikê, Bayroyê min.' Xweş tê bîra min, bavê min jî dêya min jî, em tembîh dikirin ku em qedrê wê bizanin, alîkarîya wê bikin, nehêlin kes tehda lê bike. Carînan hinek zarokan kevir diavêtin, henek pê dikirin, jê re xeber digotin. Niha jî xweş tê bîra min, min û hinek zarokên din me Eyşo diparast. Di çarşîya Licê de diçû dihat. Fistanekî dirêj lê bû, kofî li serî bû. Li ser singê wê potên ziravikên rengîn hebûn, wekî gulik bi hev ve girêdidan. Rehmetîya dêya min terzîtî jî dikir. Baş tê bîra min, carek dêya min jê re fistanek dirût. Bavê min gelekî qedrê wê digirt, tim digot 'Gotinên Eyşoya Dîn wekî gotinên aliman e.' Dikana birayê wê Hecî Reşîtî li Mehlaya Qerehesenan li hemberî fîrina Hecî Abdulah Zoraslan bû. Carînan min Xaltîya Eyşo li dikana Hecî Reşît didît. Wan deman li Licê jin dernediketin çarşîyê, alvêr karê mêran bû. Lê Xaltîya Eyşo serbest bû, carînan li ber dikanên din jî li ser piya qasî bêhnek disekinî, dikandaran pê re sohbet dikir. Lê tenê li dikana birayê xwe Hecî Reşîtî rûdinişt. Baş tê bîra min, meqberên şêx û mişayixan jî ziyaret dikir. Li ser rêya wê Ziyareta Şêx Îsmaîl hebû, dîsa li binîya nexweşxaneya Licê mezelê Mela Ebdula hebû. Ev Mela Ebdula ji malbata Xaltîya Eyşo ye. Xaltîya Eyşo tim diçû ser mezelê wan, dua dikir. Û tiştê muhîm, ewên ku Xaltîya Eyşo nas dikirin, hemî dibêjin 'Dînîtîya çi? Ew ji me hemîyan biaqiltir bû. Xwe li dînîtîyê danî ku bikaribe xwe biparêze!' Xuya ye, piştî zewaca xwe ya duduyan êdî nexwestiye bizewice."

**Hinek gotinên menşûr ên Eyşoya Dîn:**

*-Dew tune fir bike, li hespê suwar dibe çir dike.*

*-Fera qeysê me, bûye reysê me.*

*-Hesabê we were Eyşo ye, neyê veyşo ye!*

*-Xelq bû beg, em bûy legleg.*

*-Xelq bû mîr, em bûy kizîr.*

*-Xelq bû texsî, em bûy mexsî.*

*-Xelq çû hîvê, em man li bin dara bihîvê.*

*-Xelqê jin anîye, Edoyê mi jan anîye!*

*-Xelqê mêr kir, min mor kir.*


*-Xelqê ra dixtor im, ji xwu ra kor im.*

*-Xelqê tûnc anî, Emoya me bînc anî.*

Dibe ku hîn gelek hebin lê niha min karî evên hanê berhev bikim. Çawa ku dixuye, hemî aforîzmatîk in, gelek jê bi awayê mecazî wekî tabîr yanî wek biwêj/îdyom têne bikaranîn. Jixwe jenerasyona Xaltîya Eyşoyê û piştî wê jî ev gotin rojane di nav xeberdana xwe de bi kar dianîn. Tê bîra min, mezinên me her tim xeberdana xwe muheqeq bi gotineka Eyşoya Dîn dixemiland. Lê çi heyf, piranîya mezinên me koça xwe ya dawîn kirin çûn ebedîyetê. Bi wan re hem Xaltîya Eyşo hem jî gotinên wê ji tedawulê rabûn. Ji nifşê me jî, navê Eyşoya Dîn û gotinên wê di bîra gelek kêm kesî de mane.

Ji ber ku agahîyên derheqê Eyşoya Dîn de bi camêrî dan min, di serî de ji kek Bayram Ayaz re, li dû wî nevîyê Xaltîya Eyşo ji Tehsîn Varol re, her wisa ji kek Loqman Polat, Dawud Ekinci û Henîfî Akgok re gelek sipas dikim.

---



Ayhan Erkmen

## Cejna Çarşema Sor

Rojhilata Navîn dergûşa mirovahî û şaristaniyê ye. Ev ax çavkaniya gelek baweriî, ol û mezhebên pîroz e. Ji wan olên herî kewnar yek jî êzdiyatî ye.

Ola êzdiyatiyê li ser bingeha hezkirinê hatiye afirandin; êzdiyatî xwedahez, xwezahez û mirovhez e. Ji hemû bawerî, ol û mezheban re rêzdar e û aştixwaz e.

Nîşaneyên vê yên herî mezin; mirov ji pey re nabe êzdî, ji dayikê bi êzdî tê rûyê dinê. Êzdî ji bo baweriya xwe belav bikin, di nav olên din de xebatê nakin.

Dîsa êzdî ji dervayî civaka xwe bi civakên dinê re zewacê çênakin. Neyarên wan be jî dest navêjin jinên wan.

Di dîroka vê ola qedîm de gelek cejn û rojên pîroz hene. Ji wan yek jî Çarşema Sor ango Çarşema Serê Nîsanê ye; li gorî salnameya îroyîn, li çarşema ewil a ji pey 13'ê nîsanê, wekî cejna Tawisî Melek û wek Sersal tê pîroz kirin. Li gorî baweriya êzdiyatiyê gerdûn roja çarşemê ango roja çaran hatiye afirandin. Li wê rojê Tawisî Melek xwe berdaye ser axê û afirandina gerdûnê temam bûye. Roja detpêka jiyanê ye. Ev di qewlekî êzdiyatiyê de wiha tê ziman 'Te dinê xemiland hezar avaz û reng e/ Ya! Melekê Qenciyê xweş tê ji te deng e'.

Di Çarşema Sor de guneh tên efûkirin, dawî li şer û pevçûnan tê, rijandina xwînê guneh e, teqez can nayê girtin, wek roja aştî û xwişk û biratiyê ye. Hem jî despêka şênbûna xwezayê ye û di meha nîsanê de êzdî bûka dernaxin, ji ber bûka salê nîsan bi xwe ye.


Hin rêûresmên Çarşema Sor hene; di vê cejnê de hêk tên xwaşilandin û bi rengên xwezayê tên boyaxkirin. Di vê veguherîna hêkê de mena afirandina dinyayê heye. Hêk dema xav e; nîşaneya halê dinyayê ye dema ku av e. Bi xwaşilandina hêkê re dema ku dinya dibe ax û bi rengên biharê ve dema ku reng bi reng tê boyaxkirin jî tê mena, dema ku milyaketan dinya reng bi reng xemilandiye. Qalikên hêkan ên reng bi reng nîşaneya xêr, xweşî û bereketê ye. Di cejnê de, bi serdaniya goristanê, ev qalik li dora goran tê danîn. Di nav zevî û mêrgan de tê belavkirin û dîsa ev qalik bi gihayên biharê re tê hasilandin û ev hevîr bi dergehên avahiyan ve tê zeliqandin.

Reûresmek din jî çêkirina 'basimbarê' ye; basimbar bi benikên zirav ên rengîn tê honandin. Wateya basimbarê jî xêr, bereket û girtina pêşiya qeda û belayan ye. Basimbar bi destên jin, mêr, keç û zarokan tê girêdan.

Her wiha di vê cejnê de kulîçe û gelek cûreyên şîrînayan jî tên amadekirin. Li gorî biranînên nivîskar Ezîzê Cewo, dema ku kebanî kulîçeyan çêdikin moriyekê dikin nav wê. Mezinê malê di taştêya serê siba cejnê de kulîçeyê bi gotina 'ev para Mêrê Rojê, ev para Xudanê Malê, ev para Ziyayê Zer, ev para Mamereşan, ev para Mamê Şivan, ev para Gavanê Zerzan, ev para xeta cot, ev para malxiyê malê, ev para rêwiyê me, ev para xwendekarê me…' yeko yeko dijmire û kerî dike. Her kes bêsebir li bendê ye ku ka morî di para kê de derkeve.

Moriya mala me di kulîçeya para Zal'ê biraziyê we de derket, de ya bi xêr. Bila Çarşema Sor bi gelê me û hemû cihanê pîroz be. Bibe wesîleya aramî, aştî û azadiyê û ev nexweşîya kambax ji pêsira mirovahiyê bikeve.

# Cinîya bêgan û merdimê gandarî



Av.Cemîle Turhalli

Qalêk Simone De Beauvoir esta, vano 'Yew cinî nîna dinya, yew cinî bena'. Cinî heta eka bîyî dayîk/maye, la nêbîyî cinî. Çekuyêka komkerde ke qala cinîyan kena çîn ya. Sewbîna zonon'd zî cinîyo ser çekû çîn ya. Zon ma'd çekûya cinî yena a mena ke zewejyawa, keynek nêzewejyawa. Cinî pê zewaj, çekû ser keyna ra cêra bena. Pîrîka min sade vatên, "Ez kênê mêrdona, waya mêrdona, pîrîka mêrdona, cinîya mêrdona, diya comêrdona". Cinî seyî ke xwu ser tenya nêbî, nomê yin zî mêrdon ser ra bîyû. Tarîxê teolojî'd senî ke cinî astê mêrdon ra bîyû heyatê yin zî mêrdon ser dewam kerdû. Ne comêrd ra cêra bena ne zî tenya manena. Seyî ke astê comêrdon ra bîya, qarakterê ya zî kamîya ya zî çîn ya. Çunkî ya gone nîya, merdimonê goneyon ser bîya, Eîdê conê xwu nîya eîdê conêko bîn a.

Comêrd şer'id cinîyon kerdên kole. Motîvasyonê şerî ra yew zî koletî bi. Ne azadîya xwu ser ne zî conê xwu ser heqê vatişê cinîyo çîn'ib. Wexto ke kotên bin deston, bîyên mezemeyê bedelyayîşî. Cinî bîya meseleya mulko xususî.

Hezaro ser ra heta eka qet nêameyo fikiryayîşî ke cinî nêverdê rolêk pîl bigerû. Seba ke heqonê xwu bigîra, heqonê resmîyon ra bigîrên heta heqê mîras, heqê rêeştişî, heqê weçînayîşî bedelêko zehf giron dawa. Ma hol zonî, en heq hemin, litufê comêrdon ser nê, bedelê cinîyon ser biyû.

Qanûnon'd heqê cinîyon û comêrdon yo yê. Raştî'd her çî en qanûnon ra zehf dûr û. Qanûno fermî ra ver yo qanûn esto ay zî qanûno zimnî yû. En zimnî qanûn heqê comêrdon pavenû. Heqê comêrdo esas û, comêrd en heqon ser hûkimrantî kenû. Heqê cinîyon talîyû. Ay ser burokrasî û herb ra bigîrên heta ekonomî û weçînayîş, û akademî, hûmara comêrdon zehf u, însîyatîf û tehakum ho dest yin'd. Serra 2020i de, mîyonê 152 serekê dewleton'id 10 cinî estî. En reqem sermaye, parlamentoyê weçînayeyan, şaredarîyan û burokrasî'd zî eynî yû. Seyî ke serekonê dinya comêrd î, qerarê zî hêt comêrdon ra yenî dayîş. Ma zonî ke modele dewlet eynî wext'id modelê keyeyon a. Zulm keye ra dest pê kenû şinû pîyase û uca ra pê destê dewlet ser dewom kenû.

En mûhîm çî estu, nomê cînî amey vinkerdiş, kîmlîkê yê beno çînûkerdiş. Înson seyî benû vinkerdiş, Vatêyêk Hanna Arend't esta, von a" En vernî kimlîkê polîtîk yenû vînkerdiş, batpê karaktera ahlak û batpê zî bedenê înan yenû qirkerdiş." .

Coka ra raşteyê şerî de cînî bena haletê bedilnayîşî, pîyasa de keda ya çîn a, senî ke teber de yetkîya ya çîn a zerrê keye de zî çîn a. Senî ke teber de bena model, zerre de zî bena modelêko keye. Teber ra komhey modelêk yenû ben modelêk zere.

Cînî eka ser heqê xwu pavenî û fikrîyenî. Fikir yîn, qerar yin û yin û heq yin va comêrd yewi bibu. Yewîtî semedê civak ben sare, nêben tepya. Eka veng yo dest 5 û vengê di dest ben 25. Cînî deste diyînî û vazenî di dest ser civak pîl bikerî.

Cînî zonî en sîstem ena lez nêbedelyen û. Heta eka heqê xwu ser con xwu dayî, etya pêj bedelêk pil donî.

Roj çîna ke cînî nêra kiştiş. Kiştişî vera comêrdan de semedê pawiştişê heqî viyazîyenî. Comerd, cînîyan xwu rê sey tehlîkeyêk pil vîneno. Hema zî cînîyan sey mulkîyetê xwu yê xusûsî vîneno. Gorê ci tabiatê cînîyan çîn o, tabiat ya gere biat o.

Tabiat evren sê tabiat înson nîyo. Yo vîrus yeno her çî qir keno, kaînatî de her çî lez bedelneno. E wext kemonîya sîstem lez eşkere bena, ya vîn bena ya zî aver şina. Ma zonî ma eka hê sîsteme kapitalistî de yî. Sîstemê globalî de en sîstem kemonîya xwu lez eşkere kerd.En vernî gûre de cînî amey çim re vetiş, bêkartî zehfina ser cîno bîyo, temernayî keye de kiştiş û kutiş ser cînî yo bîyo zêde.

En rojo karantina de zî, Tirkîye de 29 cînî ameyî kiştiş. En zehfina kiştiş zî keye de bîyo. Zerrê keye semedê cînîyan bîyo mezel. Keye pêrodayîş û kutayîşo psikolojîk donemê karantîna de; Tirkeye de %37,2 Fransa de zî %30, Çîn Wuhand %300 bî zêde.


Pirsgirêka en sîstemid cînî raşta yew kamîya çîn ya, cînî tenyayî, ay ser heqê ya zî lez yenî vinkerdiş. Vinkerdiş eka bîyo kiştiş.

Însonîyetî eka, krîzê global feteltenenî. Ma neve zonî gonîtîya înson, herwext aver nêşina. Rê rê bêgonî tî zî înson eşkenû bifetelnenu. Roj benû bê gonî wirûs, gonîya înson ser aver şina. Zonîtîya înson qîm nêkenû bêgonî.





# Çirtika sorbêlaxî (1)



Mehmet Seyîtalîoglu

Sorbêlax awe de şenikek tede herekîna. Caye de asê ra dêva cer sey mar çivirîn o. Sey dansoz mîyano barî de xo tadana û tadana ti vana belkî nika bena di letî. Tede masî çîn ê, kesî û bêqî çîn ê. La mêşîn û dawar na awe her roj sipeno we, şimeno.  Zerre xo keno honik. Kewê xo nano ro. Kewê germê amnanî deşte germina. Na awa sorbêlaxî mal û mûlî rê çîye sey derman a.

Qêy cira vanê 'Çirtika Sorbêlaxî'. Dîyayêna ke mi dîya, rî sipîya ra ke mi heşna her çivang de awe cayo berz ra tîl bena. Çirtikê şelalê wa. Şeş hewt metroy ra zêde rawer erzîna. Şîpede be hemda. Pişk û misqalê awe ebe tîrija rojî bena bi reng bi reng. Na renginîye şewlê dana der û dorme derî ra. Ti vana belkî verrojî ebe fîrçe Leonard Davînc'i boyax kerde, bi reng be reng.

Çend serrî naye ra ver tarîxe de kan ey cayan de kemêrane aseya ra şeklê zaf bedew, rindekî bîye. Nîna ra ju distarî bîya. Di cinya dest eşto doçikê distarî. Zobîna şeklê însanan bîyo. Awsancî arey verde heykêl ostaya bîyo. Zamanêna ne eserî amey şikitenê.

Bacanaxê mi rametî Alî Kemal'î qalê Useno Zimelbox'î kerd. Tim û tim no peya ey dero derxura ra xêznaro cereno. Usen'e Zimelbox ne eserî şikitê. Zaf dolima kî amo bacanaxê mi ra alîkarîye waşta. Rametî bacanaxî qebul nekerda.

Serdestê şîpe, corê çirtikê ju hînî esto. Hona hona kî şar şono a awe ra şufa cen o. Na awa kemer û qumê vêlkare rind ena.

'Sorbêlax' çekûye de perabestîya. 'Sor' û 'bêlax', 'palax' û 'sorpalax'ê usn.

'Sor', zone ma de sûr o. Mordemîya ne zona, sey cîranîya bawde kala wa. Ebe hazaran serra dewam kena. Çekû hurînda jubînî de bi manê xuyu cayî de ena vatîş. Be nayê 'sor' çîyo ke ayar ra kewto, 'sor bid îmê ci'. Ayar bidî me ci. 'Sor ra kewt o.' 'Ayar bidî me ci.'

Sor+bêlax, sor+balax, sor+palax. Puş û palaxê.

Palax'e : vila bîyayêne, tenik bîyayêne. Huşk bîyayêne.

Dere sorbêlaxî de duşe Kakuçe de deme naye ra ver komir veto. Gore vatenanê zanayîya tamara ne komirî Dewamîra ra û dewa Tazîge û ver çarnêna koyê Bîngolî. No komire dere Kakuçê hetanî ko dewam keno.

Koye Bîngolî de şîlîye û şepelîye ke bîye laser kuno kar.

Der û derxîra ra şopê de henên herêkîna. Wele û herre fîno xo wer anake, awa nê derî. Zaf dolima mewsima te serra kifş nêkena. Gegene koyê Bîngolî de wartîş torge û şîlîye be hemd varêna. No vartîş beno lek û laser. Çi ver kûyo tafîl keno dere sorbêlaxî ra çirtika ra keno teber. Ruşnêno detştê. No laser, ge-gene halêne çuçka, gomê mara, gora pesî kî fînora xo ver. Awe de cendekê pesa, mara û çuçka laserde eno cêr deyştê. No wer kutkanê deyştê re beno roşana werî.



Dewey Ma

Cemîl Oguz

# Pistinêk mi de aşm, ê bîn de roc

Na hîkayeya lajêk wa. Lajêkêko ciwan. Ma vacê 17-18 serre. Şima eşkenê vacê wa 20 serre bo zî; ti zirarê ma tede çinî yo. Ma vacin wa namey ci zî Delîl bo.

Wa dewêk de, ma vacin dewey Zenge* de ciwanêke bîbî. Seke şima va, 20 serre bî. Serê sibay hewn ra wişt ve, dadê xo ra va: Dayê mi hewnêk ecêb vîna.

Dadî bi kêf vat: Dayê qurban, Delîlê mi, hewno seyîn bî, de mi rê qal bike.

Delîlî va: Ez qal nêkena.

Babî hame, hawna dadî û laj kewtê têver, la dadî kena nêkena laj qalê hewnê xo nêkeno. Babî zî meraq kerd ka çi hewn o ke laj dadî rê qal nêkeno. Babî zî waşt laj qal bikero, da verê zerey ci, lava, hurmet, hêrsbiyayiş, se kerd, se nêkerd feyde nêda, laj ay xo ra niyame war û qal nêkerd.

Babî va ez lajê xo bigîrî berî verê moxtarê dew, pîlê dew o yo, belkî ci qal bikero. Heme têdir şi verê moxtarî. Moxtarî va: Heyran ka mesela çi bî, ti çirê dadî û babê xo aciz kenê, de vace, to çi hewn vînawo?

Moxtarî zî kerd, nêkerd Delîlî qalê hewnê xo nêkerd. Moxtarî zî zehf meraq kerd ka eno çi hewn o ke her kesî ra nimneno. Moxtarî xo ra nêgirot, verê xo da babî û va: Deza, bê ma tûtî berê qereqole, belkî ewca vaco.

Babî va: Temam

Moxtar, Delîl û dadî û babê ci kewtî rayîr. Verê xo dayî qereqolê Hezanî*. Dima ra çende saetanê reyrayîşî resay Hezan, şî qerepol, hal û mesela serleşkerê qereqolî rê vatî û dewam kerdî: Ma se kenê nêkenê ma rê qal nêkeno ka çi hewn vînayo. Hela ti tera çike vace belkî goş bido to.

Serleşkerî zî meraq kerd, verê xo da tûtî: Wareza, ka vace, to çi hewn vînayo.

Ê zî kerd nêkerd lalî qalê hewnê xo nêkerd. Serleşkerî va: Ti şerm kenê ez heminan bikerî teber, mi tenî rê vaje.

Lacî va: Nê, mesela a nîya. Ez nêvana.

Serleşkerê qereqole va: Bawne ti nêvajê ez do to berzî nezaret, ti hendî nêşkenê veciyê teber.

Reyna zî lajî nêva. Laj di ay xo de israr kerdêne, înan zî fek tera vera nêdayne. Jo, di, hîrê, lavay, qelebalix, hêrsbîyayîş, waştiş û hum û gume dewam kerdî. Tam a esna de pîlêk ame qereqolî qey karê ci estbî. Ma vaci namey ê zi wa Celadet bo. Celadet hawna dadî weled erzena, jo nêzano ka çi vano, şî verê înan, va:

- Xêr o, şima se kenê, vengê şima şino heta Licey… Tay mendo lîceyici bêre goştarî şima…

Serleşkerî va Celadet wele hal û mesela anawa, ma kenê nêkenê ma rê qalê hewnê xo nêkeno. Celadetî verê xo da lajî û va: Wareza, xêr bo, ka to çi hewn vîna?

Lajekî çawey "xêr bo" şinawit va: Bawnê, şima endêke tenî etiyayê joy nêva xêr bo, joy nêzana vaco xêr bo, enî xaloy va. Serê heme çî xêr o. Xêr çinê bo çi nêbeno. Xêr ma beno sere, bêxêr ma beno peynî. De ez vacî.

Heminan va: Wele ti rast vanê.

Lajî va: De ez qal bikerî. Emşo mi hewn vîna di pistinêk mi de aşmî, pistino bîn de roj bîbî. Ez anakî hewn ra wişta we.

Serê ene joy ra dadî û babî şaş bîbî, hewn tenî eno bi nêvatê?.. La Moxtarî va:

- Wele ti lajêko zaf biaqil ê. Keynayêk mi esta ez do aye bidî to, bibe zamayê mi.

Serleşkerî verê xo da moxtarî: Moxtar, wele ti zî rast vanê. Ez do zî keynayê xo bidî ci.

Delîlê ma keynayê moxtarî zî, keynayê serleşkerî zî girot û va: Bawnê, pistinêk mi de aşmî, ê bînî de zî roj est o.

Bi kêf û şahî geyray a û hamey dew.

***

***Not: Ez bi hîkayan biya pîle. Pîlanê ma zehf ma rê hîkayey vatê. Mi ê bi namey "Hîkayeyey Tûtînî Mi" kom berdî û belkî rocêke ma neşr bikerin. Ene hîkaye zî jo înan ra bî. Tiya de mesela a wa ke heme çî bi "wa xêr bo" dest pa keno. A rast wazenê di destpakerdinê heme çî de însan pozîtîf bo, bi weşî dest bi çî/karî bikero. A çaxî go bi ser biko. Mi waşt enka jo ê hîkayan re şimadir bare bikerî. Kakilê hîkayan mi nêxerepnay, la gorey ziwanê enka min saz kerdê.***

****Zenge û Hezan, wirdî zî dewey Liceyê.***




# Stalîn û mirîşka peritandî




Stalîn, rojek ji rojên zivistanê ew û hevalên xwe biryara vexwarina "Vodka" dide ku meya Rûsyayê ya herî bi nav û deng e û diçin vedixwin. Di kêlîkeke kurt de serxweşî û sermestiya wî dest pê dike. Stalîn, ji hevalên xwe re dibêje,ji min re Mirîşkek sax (zindî) bînin!

Hevalên wî mirîşkek zindî jê re tînin. Stalîn, perîkên mirîşkê hemûyan bi saxî dirûçikîn e , û taliyê wê bera dide, mirîşk bi hemû hêza xwe, weke xwe ji mirinê xelas kiribe bi derde direve, ji ber seqema Rûsyayê. Bi hêla bixêriyêve (Şomîne) direve dema xwe dide tîna agirê bixêriyê çermê mirîşka bê perik dişewite, mirîşk ji ber şewata çermê xwe bi şûnde vedigere tê li ber lingê Stalîn dimelise.

Stalîn mistek êm bera ber mirîşka peritî dide, mirîşk radibe ser piya û Stalîn bi ku ve diçe mirîşk dide pey wî, taliyê Stalîn li hevalên xwe dizîvire û weha dibêje: Gel mîna vê mirîşkê ye. Dema te perîkên wan rûçikandin wê bêçare û bê parastin bimîne, wê demê tu biçekî êm bidî wan nema tu carî dev ji te ber de.

***Werger:Sebrî Vûral***

# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

3.Ol 5.Cihê ku genim lê tê hêran 7.Hunermendeke kurd 8.Noteyek muzîkê 9.Rih 13.Rojeke hefteyê 14.Roja em tê de ne 16.Cih 19.Xweşik, Bedew 20.Yan 21.Naveke jinan yê kevnar 22.Pêxemberek25.Agir 26.Amûreke muzîkê 28.Zimanê kurdan

**JI JOR BER BI JÊR**

1.Bajarekî Rojavayê Kurdistanê, bajarê evînê. 2.Weke 3.Noteyeke muzîkê 4.Amûreke muzîkê. 6.Hatina baranê 10.Bajareke mezin ê kurdan, bi gola xwe bi nav û deng e. 11.Cihê ku ava çeman tê de diherike. 12.Berpirsiyarê mîrîtiyê. 15.Rêje 17.Bajareke kurdan ê sar . 18.Televizyoneke kurdî. 20.Navê parzemînekê. 23.Eslê kurdan 24.Herî zêde zarokên biçûk vedixun. 27.Noteyeke muzîkê

**Bersiva hefteya borî**



# Derbên bazirganan

Xoce li ser darê ye û gulîyê binê lingê xwe dibire. Zilamekî di wê re derbas dibe, jê re dibêje:

- Niha ku tu gulîyê darê bibirî tuyê bikevî xwarê.

û diçe. Xoce gulîyê darê dibire û tevî gulî dikeve xwarê. Radibe bi şopa wi zilamî dikeve. Ku jê re bêje çawa zanibû ku ezê bikevim xwarê? Niha dizane ez ê kînga jî bimrim?

Bi lez diçe û digihêjê û jê re dibêje:

- Te çawa zanibû ku ez ê bikevim? Niha tu dizanî ka ez ê kîngê bimrim jî. Zilam çiqas dibêje ez nizanim jî, lê ji xoce xelas nabe. Zilam dibêje:

- Niha ku tu kerê xwe bar bikî û bidî qiyamê heke ku kerê te heft car bizire tu yê bimirî û diçe.

Xoce tê kerê xwe bar dike û dide qiyamê. Kerê wî carek dizire. Xoce dibêje rihê min hat guîzekê. Cara diduyan dizire, dibêje rihê min hat çongê. cara sisîyan dizire, dibêje welehî hate navê. Cara şeşan dizire, xoce dibêje welehî rihê min hate qirikê. Tirs dikeve dilê wî û difikire.

- Gelo ka ez devê kerê girê bidim, ez çi bikim?

Taliyê dibêje:

- De qey qedera xwedê wiha ye. Çi di enîya mirov de hatibe nivisandin, ew ê were cîh.

Kerê xoce cara heftan dizire, xoce dibê rep û dikeve xwarê. Li der û dora xwe dinihêre dibîne ku wayê kozikekî li wê derê ye. Radibe û diçe dikeve nava kozikê. Lê kerê wî ji derve ye. Dinihêre ku du heb gur hatin û ketin ser kerê wî. Xoce dibêje:

- Bila te bixwin, dilê min li te rihet bikin. Bê xwedî. Qey te cara heftan ne zirîyaba ma wê kevir bibarîya? De bila gur te bixwin.

Xoce çend roj di kozikêde dimîne, dinihêre ku wayê dengek tê. Serê xwe ji kozikê derdixe, dibîne ku bazirgan ji wê de tên. Bi serî derxistina xoce re hêstirên bazirganan ditirsin û hêstira pêşîn diçe li ya dawin dikeve û hemî cam û camxanê wan dişikên. Bazirgan tên li wan deran dinihêrin û xoce dibînin û di qefêlin. Zanin ku sedemê vê zirar û zîyanê xoce ye. Têr û ser têra wi lê dixin. Tevde canê wî reş û şîn dikin. Hemî parsuyê wî dişkênin û jê re dibêjin:

- Biteqize, ji vir here. Em carekî dinê te li vir bibînin, emê te temam bikin. Wî li kerekî lexer siwar dikin û wî birê dikin. Xoce tê malê hevsera wî dibêje:

- Xoce ev çend rojin tu li kuderê mayî û ev çi halê te ye?

Xoce dibêje:

- Hurme qet nepirse, hal û mesela min eve.

Hevsera wî dibêje:

- Xoce tu mirî lê tu çawa hatî malê?

Xoce dibêje:


- Hurme welahî bera min dan ji min re gotin tu li vir alozîyan derdixî biteqize here mala xwe û gotin em carekî dinê te li vir bibînin em ê te temam bikin. Xwedê hîvza mirovan ji derbên bazirganên wê dinyayê bike keçê.

***Riza Uyar***

# Albûma Botanê û vejandina dengan

Welat Ramînazad

Albûma Botanê vejendina dengên kurdî ye. Ev bi taybetî jî di kilamên Çiyayê Cudî, Heyran Jaro, Êvar E û Mîrane de xwe nîşan dide. Di albûmê de ahenga deng û gotinê gelekî xweş û geş e




Ez muzîka kurdî wekî muzîka tradîsyonî; devkî û teknolojîk dikim du kategorîyan. Ji muzîka modern a kurdî qesta min ew muzîk e ku bi amûrên teknolojîk ên wekî plak, kaset û di studyoyan de çêdibe. Muzîka tradîsyonî jî naturel e, di nav gel de çêdibe. Temenê muzîka kurdî ya teknolojîk a Bakur herî zêde dikare xwe bigihîne salên heftêyan. Piştî ku gund hatin valakirin û şewitandin, ekserîyeta nufûsa kurdan berê xwe da bajaran. Li dû salên nodî muzîka kurdî ya teknolojîk geş bû lê vê geşbûnê xwe li ser tradîsyona xwe ne; li ser teqlîd û îdxalkirina muzîkên gelên din ava kir. Ji ber vê yekê muzîka kurdî hem ji tradîsyona xwe ya salan qetîya hem jî nekarîbû tradîsyoneke nû jî ava bike û tê de qrîzeke ontolojîk peyda bû ku hêj jî didome.

Bi taybetî piştî salên du hezar û dehan di muzîka kurdî de (qesta min muzîka kurdî ya Bakur e) hewldan û lêgerîna avakirina tradîsyoneke nû, sentez û modernîzekirina muzîka tradîsyonî dest pê kir. Bingeha hewla avakirina tradîsyoneke nû bi piranî edebîyata kurdî ye. Ew dixwaze ji wir tiştekî derxe. Hewldanên modernîzekirina muzîka kurdî jî li ser qada muzîka tradîsyonî ava dibin. Ew dixwazin senteza muzîka teknolojîk û tradîsyonî çêkin. Sedema van lêgerîn û hewldanan a yekem, qrîza ontolojîk a ku muzîka kurdî tê de ye. Li cîyekî ez rastî tespîteka etnomuzîkologekî belçîkayî hatibûm. Wisa digot: "Civakên ku kilamên xwe yên gelêrî nabêjin, kultura wan civakan mehkûmê tunebûn û korbûnê ye." Mirov dibêje qey ev tespît ji bo rewşa muzîka kurdî ya îroyîn hatîye gotin… Ev tespît jî sedema duyem a hewldan û lêgerînan îzah dike. Çimkî ji muzîka kurdî ya teknolojîk hema hema tu tişt nehat.

Berîya vê bi çend rojan albûma nû ya Awazê Çiya bi navê "Botan" li ser platformên medyaya civakî hat belavkirin. Di albûmê de deh kilamên gelêrî yên herêma Botanê, kilamên bi kurdîya kurmancî hene. Aranjorê albûmê jî Mehmûd Berazî ye. Hewldan û lêgerînên deh salên dawî yên muzîka kurdî di albûma Botanê de xwe bi zelalî û geşbûnî nîşanî me didin.

Piranîya mirovên bindest çi amûrên çanda xwe yên maddî çi yên manewî qedir û qiymeta wan nizanin û wan naparêzin. Di nav çanda kurdî de qadeke ku zahf hatîye îxmalkirin jî qada dengên kurdî ye. Ger ez ne xelet bim, di muzîka kurdî de li ser deng, rîtm, tingîn… ên kurdî xebateke zanistî ya qeydkirin, berhevkirin, pênasekirin, cûrekirin, tasnîfkirin û hejmartina dengan çênebûye. Gelo di muzîka kurdî de çend deng hene? Taybetmendîyên wan çi ne? Çiqas dengên muzîka kurdî mirine? Mirina dengan li gorî yê gotina zûtir çêdibe. Divê em gavek berî gavekê dengên kurdî berhev bikin û ji mirinê xelas bikin.

Beramberî her gotinê dengek heye. Lê beramberî her dengî gotinek nîn e. Pêşî deng hebû, paşê gotin çêbû. Gotin bikodbûna dengan e. Lorik û **hawar** deng in. Kilam, gotin in. Lorik û hawar li gorî kilaman prîmîtîf in. Çawa resm bi xêzekê dest pê dike, mirov dikare bêje muzîkê jî bi tingîna lorikan dest pê kirîye. Di muzîka kurdî de ji hêla gotinê ve mêr serdest in. Ji hêla dengan ve jî jin serdest in. Di albûma Botanê de serdestîya dengên muzîkjenên jin berbiçav e. Gotin bi îqtidarê ve têkildar e, deng bi bindestbûnê ve. Ji ber vê bindest, klîşeya "Hûn dengê me nabihîzin"ê tekrar dikin. Spîvak di xebata xwe ya bi navê "Madun dikare qise bike" de nîşanî me dide ku gotinên madunan/bindestan tune ne, yên wan tenê deng in. Di muzîka kurdî de jinên kurd çima ne domînant in û ne xwedî gotin in? Hêja Netirkê di rojnameya Yeni Ozgur Politikayê de, li ser vê pirsê nivîseke bi navê "Wî wî wî" nivîsîbû. Ji hêla dengên muzîka kurdî ve serdestbûna jinan, di peywendîya deshilatdarîyê de bindestbûna wan nîşanî me dida.

Deng ji gotinê gelekî biqudrettir e. Peywendîya gotinê bi hiş ra heye lê ya deng bi ruh, bîra kolektîf û takekesî ra heye. Helbest çiqas kûr û geş be jî nikare xwe bigihîne geşbûn û kûrbûna dengê muzîkê. Marcel Proust, di Gerran Bo Katî Ledestçû (Li Soranî wilo hatiye wergerandin) de, di qismeke dirêj a romanê de dixwaze kûrbûn û geşbûna vê parçika berhemeke muzîkê vebêje lê gotin têrî wî nakin. Di fîlma Kazim Oz "Zerê" de meriv dibîne ku dengê kilamekê çawa dibe wesîleya rêwîtîya ber bi xwebûna xwe ve.

Têkilîya bîra takekesî û kolektîf a bi muzîkê re çi ye? Dema ku berhemeke muzîkê karibe hem xwe bigihîne bîra takekesî, hem jî ya kolektîf wê çaxê ew berhem mayinde dibe. Muzîkjenên kurd gelek caran di bîra takekesî de dimînin û nikarin di nav bîra kolektîf û takekesî de sentez an jî pirekê çêkin. Jixwe muzîka kurdî ya teknolojîk ji bîra kolektîf a tradîsyonî qetîyaye.

Muzîka kurdî ya teknolojîk tenê ji hêla gotinan ve na, ji hêla dengan ve jî ji tradîsyona xwe qetîyaye. Piranîya gotinên stranên muzîka kurdî ya teknolojîk, bi peyvên kurdî lê bi mantiqa zimanê tirkî tên nivîsandin. Li gorî gotinê, xisareke mezin li dengên kurdî ketiye û ew hatine îxmalkirin. Lê albûma Botanê vejendina dengên kurdî ye. Ev bi taybetî jî di kilamên Çiyayê Cudî, Heyran Jaro, Êvar E û Mîrane de xwe nîşan dide.

Di albûmê de ahenga deng û gotinê gelekî xweş û geş e; ew zewqeke edebî ya kûr dide me. Dema ku ez li albûma Botanê guhdarî dikim, ji gotinên kilaman zêdetir di nav dengên kilmanan de kûr dibim û diponijim...

Giringîtirîn alîyê albûma Botanê ya Awazê Çiya ev e ku senteza muzîka kurdî ya tradîsyonî û teknolojîk çêkirîye û tradîsyona muzîka kurdî ji nû ve diafirîne, wê modernîze dike. Bi hêvîya ku ev alîyê albûmê jî bibe mijare nivîsa kesekî/e din…

# Bi salan e ji kurdî re xizmetê dikin

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê di 18'ê nîsana 1992'an de hat damezrandin û bû yekem saziya bi vî rengî ya li Tirkiyeyê damezrandî. Ênstîtuyê 28 salan tevkariyeke girîng li parastin, bipêşvebirin û berbelavkirina kurdiya nivîskî kiriye û îro jî weke Komeleya Lêkolînên Kurdî bi heman erka xwe radibe.

Di nava damezrênerên Enstîtuyê de Mûsa Anter, Feqî Huseyîn Sagniç, Îsmaîl Beşikçî, Yaşar Kaya, Abdurrahman Durre, Cemşîd Bender û Silêman Imamoglu jî hebûn. Enstîtuyê di ser hesabê xwe yê Twitterê agahiyên li ser dîroka xwe jî bi vê munasebetê par ve kirin.

Enstîtuyê diyar kir ku endam û serokên Enstîtuyê gelek caran rastî zextên sîyasî hatine. Serokê demkî yê Enstîtuyê Apê Mûsa hatiye qetilkirin, alavên Enstîtuyê hatin desteserkirin û herî dawî jî di 31ê Kanûna 2016'an de derîyê wê hatîye morkirin. Wê wisa dewam kir: "Kitêb û alavên wê careke din hatine desteserkirin û li sazîyên dewleta tirk hatine dabeşkirin. Lê belê dildarên Enstîtuyê li rexmî van hemû zext û hereşe û gureşeyan xebatên xwe ranewestandine û her dirêje bi xebatên xwe dane." ***STENBOL***






# Berhemên jinan li ser dîwaran

Gundekî eşîrî li Hindistanê heye bi navê Hezarîbax. Li Hezarîbaxê rêûresmeke pîroz a jinan heye, belkî jî ji bo Hezarîbaxê bikin hezar û yek bax.

Ew dîwarên malan ne tenê direngînin, ew li ser wan wêneyan xêz dikin ku teknîka wan jî ji rêûresmê ye.Jinên ciwan ji jinên bi tecrûbe fêrî vî hunerî dibin. Ev jinên bi tecrûbe jî yan dayik yan jî xaltîkên wan in. Hunermendên jin bi awayekî sîtîlîstîk heywanan, xasma teyr û tilûran xêz dikin, giya û daran û jiyana çêm û avê xêz dikin. Ji van wêneyan û vê şêwekariyê re tê gotin resmên rîtuelan ên Xovar. Xovar ji bi zimanê wê deverê ji bo binavkirina şikeft û zivingan tê bikaranîn.



Sidar Jîr

# Çîrokên Temirandî

Di edebiyatê de hewldan her dem rê li ber nivîskar û berheman vedike. Ev yek wekî jan û tevzîyên zayînê ye… Piştî êş, jan û wan tevzîyan mirov dikare bi berhemê şa bibe. Di rastîya xwe de ya ku em pê şa dibin hewldana nûjenîyê ye…

Nûjenî di nivîsê de wêrekî û bixwebawerîyê divê, lewma jî divê nivîskar di vê rêyê de çavên xwe ji keleman neparêze. Bi gotineke ditir divê mirinê bide ber çavên xwe. Ji ber ku helwest û hewldana nûjenîyê çawa ku mifteya serketin û mayîndebûnê dide destê nivîskar, bi heman awayî ku nivîskar di vê helwestê de bi ser nekeve rêya têkçûn û windabûna xwe jî vedike…

**Lê heger nivîskar çavên xwe ji keleman biparêze wê demê çi dibe?**

Di vê çarçoveyê de pirtûka çîrokan a Bahoz Baranî ya bi navê "Qiza Bavê Xwe" mînak e ku nivîskar çavên xwe çawa ji keleman parastîye. Hema bibêjî di hemû çîrokan de tişta ku çîroknûs kiriye afirînerîya hişî û çîrokî li hêlekê daniye yan jî nexwestîye/newêrîye bi zimanê xwe yê bi rastî jî di vê pirtûkê de gelekî şahîk e çeperên çîroknûsîyê ya rastir qet nebe ya çîroknûsîya xwe derb bike. Bêguman di berhemeke xurt de ya ku derdikeve pêş ne tenê dirûv û naverok e, yekparebûna estetîk û hunerî ye. Xurtîya estetîk û hunerî jî ne di dubarekirina "yên kevin" de ye, di nêrîn, ditin, keşfkirin, afirandin û berfirevkirina aso yan jî çeperên heyî de ye. Heta ku mirov zorê bidê, piştî qonaxekê êdî nûjenî redkirina yên heyî ye. Ev jî seqayeke ku nivîskar bi xwe û helwesta xwe diyar dike. Wekî afrînerê metnê, nivîskar dikare çiqasî rê û dirban li ber metna xwe, çîroka xwe veke? Girêka ku divê were çareserkirin jî ev e. Ew ê yên heyî bi awayê heyî dubare li ber me ro bike yan ew ê zorê bide çeperên metnê û asoyên ditir li ber me û "çîroknûsîya me" veke? Ew ê bihêle ku xwîner piştî xwendina metnê pirsa "Êêêê?" ji xwe bike û li bersivên xwe bigere yan piştî xwendina her çîrokê ew ê çîrok jî li wir bitemire? Heger armanca me tenê vegotina "tişt"ekî be(!) wê demê nivîskar çîroknûs bi rastî bi ser ketiye. Ji ber ku di meseleya zimên de, nivîskar gotinên xwe bi rastî jî weziniye, teqilandiye, pîvaye û paşê wekî hevok saz kiriye da ku di xwendinê de mirov lê nelikume. Baş e, çîrok û çîroknûsî ew e ku mirov tenê nehêle xwîner di dema xwendinê de nelikume? Wê demê ka heyecan, ka nûjenî, ka raman, ka hişê çîrokê li ku dimîne? Mînak, "Sûc û Ceza", berhem di bingeha xwe de bi xwîner re felsefeya exlêq nîqaş dike, berê xwîner dide asoyên firehtir. Jixwe di hemû berhemên edebî yên xurt de ev yek heye… Bêguman xurtîya berhemeke edebî ne tenê bi çîrok/bûyer an jî şêwaza vegotina nivîskar e. Bêguman ev hêmanên bingehîn in, lê ya ku berhemê xurt dike lêgerîn, pirs û bersivên ku xwîner bi xwe û hebûna xwe dibersivîne.

Di vê çarçoveyê de "Qiza Bavê Xwe" piştî xwendinê heta tu bibêjî apolitîk dibe.

Heger bersiva "Êêê?" piştî xwendinê xwîner ber bi asoyeke din ve nebir, pirs li pirsê zêde nekir û bersivên ku ji metnê kûrtir in derneketin holê, wê demê nivîskar tenê tiştek kiriye: Bi zimanê xwe yê xurt çîrokên gelekî ji rêzê û qels nivîsandiye…

****BARAN, Bahoz – çîrok, 112 rûpel, Weşanên Wardoz, 2019***

xwebûn

20-26 Nisan 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 18

***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*** Kadri Esen
***Sorumlu Yazıişleri Müdürü:*** İdris Gürmez
***Yayın Danışma Kurulu:*** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz İbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
***Yayın Türü:*** Haftalık Yaygın Süreli
***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Hecî Qadirê Koyî û Rojnameya Kurdistanê



Ahmed Kanî

Wek hemû rojnameyên pêşîn ên neteweyan rojnameya Kurdistanê jî piştî pêvajoyeke dûr û dirêj a di qada çapemeniyê da karibûye derkeve pêşberî xwendevanan. Gelo dema ku Mîqdad Mîdhet Bedirxan (1858-1915) di 22yê Nîsana 1898an da, dest bi weşana rojnameyê li derveyê welêt dike, atmosfera welêt û ya cîhanê çawa bûye?


Bi nêzîkî 460 sal berî ku rojnameya Kurdistanê li Qahîre/Misirê derkeve çapxane ji aliyê dahêner(mûcîd)ê Almanî Johannes Gutenberg (1398-1468) ve tê dahênan. Ev dahênan derfetek giranbiha bû. Heta wê serdemê jî hemû berhem bi destxetan dihatin amade kirin. Cara pêşîn dema Dr. Kemal Fuad lêkolîn li ser destxetan dike li Almanyayê rastê rojnameya Kurdistanê tê.

Çapxane, bi derengî be jî hat nava dewleta Osmanî. Di sed sala 19. da dewleta Osmanî dixwest pêşiya neteweyên ku doza mafê xwe yê neteweyî dikirin bigire. Di nîvê pêşîn ê vê sed salê da mîrektîyên kurdan ji holê hatine rakirin. Herî dawî di sala 1847an da mîrê Botan, Mîr Bedirxan(1806-1869) û malbata wî bi darê zorê ji welêt der dixin. Li Stenbolê gelek zanyar û alimên kurdan digihîjin hev. Kar û xizmeta neteweya kurd dikin. Yek ji wan zanyaran jî Hecî Qadirê Koyî ye.

Di gelek çavkaniyên ku li ser dîroka kurdan û bi taybetî li ser malbata Bedirxaniyan hatine nivîsîn da, em dibînin ku Hecî Qadirê Koyê (1816-1897) mamostetîya zarokên Mîr Bedirxan kiriye. Em bi saya van çavkanîyan digihîjîn wê qen'etê ku Hecî Qadirê Koyî bandorek mezin li ser Mîqdad Mîdhet Bedirxan û Evdirehman Bedirxan (1868-1936) kiriye da ku rojnameyek kurdî biweşînin. Lê mixabin Hecî Qadirê Koyî salek berî ku rojnameya Kurdistanê derkeve, di 1897an da li Stenbolê çûye ser dilovaniya xwe. Gora wî jî li goristana Karacaahmed e. Mixabin bi tevî gelek lêgerînê jî heta nuha kurd bi ser gora wî ve nebûne. Divê kurd gora pêşengê modernbûna xwe bibînin.

Di jimara sêyem a rojnameyê de, wefata wî wiha dertê: "Alimek ji Sora hebî. Sala dî wefat kir; rehma Xweda lê be, Xwedê gunehên wî bixefirîne! Navê wî Hacî Ebdulqadir bî. Ev mirov saxîya xwe de gelek xebitî; derheqa elimandina ilm û marîfetê de gelek beyt û eş'arên kurmancî dinivîsî, rêdikir welatê xwe Sora. Ezmanê wî ezmanê Sora ye. Loma kurd hemî vî ezmanî nizanin. Pişta kitêba "Mem û Zîn"ê de bi xetê destê xwe hin beyt nivîsîne. Teberruken min ev ebyat li vê cerîdeyê de nivîsîn. Wekî bi dîqet bê xwendin, mana wan xweş têt famkirin:


*Zemane resmî caranî nemawe*
*Çiraxî nazim û munşî kujawe*
*Le dewrî ême roman û cerîde*
*Eger çi meqsede zanînî bawe*
*Eman qedrî bizane em kitêbe*
*Le dunya êstekey hemtay nemawe*
*Le eyyamî heyatî Şêxî Xanî*
*Le ser nusxey ew nûsirawe*
*Le lay erbabî xoy bo qedr û qîmet*
*Xezîney gewhere-w kîse diraw e*
*Le mecmûî duwel Soran û Botan*
*Le sayey em kitêbe nasirawe*
*Le kurdan xeyrî Hacî-w Şêxî Xanî*
*Esasî nezmî kurdî danenawe."*




Di kovara Hawarê hejmara 33yan da, di bin sernavê "Klasîkên Me" da Celadet Bedirxan jî vê helbestê nivîsîye û gotîye ku "ev li ser 'Memozîna bavê min' a destxetê ji aliyê Koyî ve hatibû nivîsîn."

Bi kurtî meriv kare bibêje ku Hecî Qadirê Koyê pêşengiya modernbûna kurdan a di qada çapemenî û edebiyatê da kiriye.

Helwesta dewleta Osmanî li hember rojnameya Kurdistanê gelek tund bûye. Rojnameya Kurdistanê di 22yê Nîsanê da derdikeve. Di nava hefteyek li dû derketina rojnameya Kurdistanê da, 30ê Nîsanê fermana Siltan Evdilhemîdê Duyem (1842-1918) a qedexekirina rojnameya Kurdistanê li her derî belav dibe. Ev jî nîşan dide ku her dem mafê rewa yê neteweya kurd ji destê wê, bi darê zorê hatiye sendin. Rojnameya Kurdistanê 122 sal berê derketibû, em hêjî negihîştine hejmara 19. a wê. Kesên ku bixwazin bigihîjin 30 hejmarên wê yên li ber destê me dikarin malpera www.rojnameyakurdistan.com ê ziyaret bikin.







# Zêrzewan ket lîsteya demkî ya UNESCO'yê

Keleha Zêrzewanê di navbera navçeya Çinara Amedê û navçeya Şemrexê ya Mêrdînê de li serê girek bilind e. Dîroka wê nêzî 3 hezar salan e. Tê gotin ku di serdema Împaratoriya Romayê wek niştecîha leşkerî hatiye bikaranîn.

Vê keleha dîrokî û di çend salên dawî de ku bûye cihê gera geştiyaran ket Lîsteya Derbasdar a Mîrateya Dinyayê ya UNESCO'yê. Ji bo ku Zêrzewan bikeve lîsteya UNESCO'yê Platforma Turîzmê ya Odeya Bazirganî û Pîşesaziyê (DTSO) ya Amedê di meha çileya 2020'an de serî li UNESCO'yê dabû.

Li kelehê hêj kolandina arkeolojîk didome. Di kolandina sala 2018'an de Perestgea Mîthras derketibû holê û bi vê perestegê ketibû rojevê. Di sala 2019'an de 350 hezar kes çûne serdana Keleha Zêrzewanê. Tê gotin ku wê lêkolîn ango kolandina vê keleha dîrokî heta 50 salan bidome.

Hevserokê Odeya Mîmaran a Amedê Ferît Kahraman diyar kir ku vê biryara UNSECO'yê kêfxweşiyê dide wan û wiha got: "Li wir dîrokek hêj baş nayê zanîn heye. Hêj li bendê ye ku dîrokek veşartî derkeve holê. Em spasiyê xwe ji ekîba kolandinê re jî dikin. Li gel vê biryara erênî ya UNESCO'yê pêwîste were rexnekirin jî. Wek ku hûn dizanin tevî hemû bangên ji bo UNESCO hat kirin jî bêdeng ma û ji bo navçeya Sûrê ya di Lîsteya Mîrateya Çandê ya Cîhanê de cih digire xemsar ma. Ji pêvajoya şer heta niha cara ewil bû ku dê Sûrê ziyaret bikirina. Lê ji ber şewba koronayê plansaziya wan hat taloqkirin. Em hemû bûn şahid ku UNESCO berpirsiyariya xwe ya li Sûrê pêk neanîn. Pêwîst e UNESCO hin bêtir xwedî li cihê hin xistiye bin parastina xwe derkeve û bêxwedî nehêle." ***AMED***



# Mîtra li Romayê

Li navenda paytexta Romayê, mirov di encama gelek kolanên arkeolojîk de wan perestgehên mîtraîstan dibîne. Em behsa xwedayê mîtolojiya kevin a Arî, Mîtra dikin. Ew di mîtolojiya Arî de ew xweda ye ku bi qurbanîkirina gayî, jiyanê dide destpêkirin.

Lê piştî reformên Zerdeştan, ev xwedayê di heman demê de yê rohniyê ye jî êdî girîngiya xwe ji dest dide. Diyar e ku li Kurdistana îro ev girîngiya Mîtra, tevî reformên Zerdeştan jî maye. Ji ber wê jî eskerên Romayê yên li Kurdistanê, zûzûka perestgehên binerdê û veşartî yên Mîtra çêdikin, ev perestgeh tenê ji bo eskeran e; yanî ne ji bo jin, zarok yan jî endamên din ên malabatan in. Ew eskerên Romayî vê baweriyê dibin paytextê jî û heta sedsala 4'an beriya mîladê jî li wir bi lez belav dibe. Piştî hingê ev baweriya hanê ya di nava eskerên Romayê de belav li temamê Ewrûpayê jî belav bûyî, êdî tesîra xwe kêm dike û pêre pêre namîne. Lê şûna wê mirov dikare weke di vî wêneyî de li paytexta Îtalyayê Romayê jî bibîne. Ne dûrî Frankfurtê, li muzexaneya Wetterau jî di ketina muzexaneyê de rolyefeke mezin a Mîtrayî heye ku ji garnîzona kevin a Romayiyan a li heman deverê hatiye derxistin. ***FRANKFURT***